# Îradeya gelê kurd bi ser ket

**Gelê kurd di boykotkirina referandûmê de ligel astengiyên dewletê û hikûmeta AKP'ê dîsa jî bi serkeft. Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş piştî encamên referandûmê diyar kir ku gelê kurd bi biryara boykotê îradeya xwe daniye holê û ji niha pê de divê makeqanûnek nû bê amadekirin**

## Encama referandûmê nirxandin

Piştî referandûmê nîqaşên li ser encama referandûmê zêde bûn. Gelek nivîskar û rewşenbîran diyar kir ku encama referandûmê dê rê li pêşiya çareseriya demoratîk û siyasetê veke. Rewşenbîran anî ziman ku bi vê encama referandûmê hate dîtin ku bêyî vîna kurd pirsgirêk çareser nabe... *RÛPEL - 4*

## DIVÊ HER KES ENCAMÊN DERKETINE HOLÊ BAŞ BIXWÎNE

Piştî encamên referandûmê aşkera bûn Hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak li Amedê derketin pêşberî çapemeniyê. Demîrtaş got, divê her kes encamên derketine holê baş bixwîne. Demîrtaş wiha got: "Ji vê saetê pêve divê makeqanûneke nû bê çêkirin. Ji nava encaman ên daxwaza xweseriyê dikin, mafê perwerdehiya bi zikmakî dixwazin divê baş bê xwendin."... R.5

## KCK: Siyaseta çareseriyê serkeft

Konseya Rêveber a KCK'ê destnîşan kir ku li hemberî dek û dolabên dewletê yên ji bo şikandina îradeya gelê kurd a ji bo boykotê, encamên derketine holê serkeftî ne û serkeftina ji bo boykotê di heman demê de rê li ber siyaseta çareseriyê vekiriye û wiha got: "Gelê kurd careke din sekna xwe ya bi rûmet nîşan da. Gelê Kurdistanê bi serkeftina boykotê siyaseta dewleta tirk a li ser bingeha înkar û îmhayê tê meşandin red kiriye. Di vê referandûmê de gelê Kurdistanê Makeqanûna Komara Tirkiyeyê qebûl nekiriye û çareseriya xweseriya demokratîk erê kiriye. Ligel şert û mercên ne wekhev sekneke bi rûmet hatiye nîşandan. Mêtingerî bi dîwarê boykotê ketiye. Û di heman demê de hêza Rêber Apo û tevgera demakrasiyê ya kurdan bi awayekî zelal daniye holê."

www.welat.com

# Rojeva Welat

14 Îlon 2010 Sêşem Buha: 50 Kr Hejmar: 7 E-mail: awelat2002@yahoo.com



## Hefteya krîtîk a bêçalakîtiyê dest pê kir

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê û Kongra Gel, di 13'ê Tebaxê de, ji bo şansekî bidin hewldanên çareseriya demokratîk biryara bêçalakîtiyê îlan kirin. Ev biryara KCK'ê bû sedema zêdebûna hêviya çareseriyê. Lê dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê li şûna ku bersiveke erênî bide biryarê, di siyaseta şer de israr kir... *R.3*



## Saziyên sivîl ji bo rewşa bêçalakîtiyê civiyan

Rêxistinên civakî yên sivîl ên Amedê yên ku banga agirbestê li PKK'ê û dewletê kirin û PKK'ê bi awayekî erênî bersiva wan da, bi rojeva "bêçalakîtiyê" li Amedê kom bûn. Hate zanîn ku rojeva civînê bêçalakîtî, rawestandina operasyonan, muzakere û diyalog dest pê bike, dê dîroka bi rayedarên dewletê re hevdîtinan bikin diyar bikin... *R.4*



## Dêrsim veşeno rayîrberî ewnîyenê

3 roj verî di paştîdayişê operasyona hewayî ya bejayî di, daristananê dewa Bîrdo veşnay. Daristan 3 rojo ke veşeno. Veşayişê daristanî xo resna sînorê qeza Hozatî. Goreya ke yeno vatiş şewat Ovacixî ra weş eyseno û her ke şino şewat xo verê Hozatî keno û veşeno û hîra beno. Kesîy nêşenê xo biresnê şewata daristanî... *DIMILKÎ* *R.9*

# 'Hefteyekê zarokan neşînin dibistanê'

Gelê kurd di boykota referandûmê de bi awayekî serkeftî derket. Vê carê jî li dijî asîmîlasyonê ji bo pêkhatina perwerdehiya bi kurdî dê hefteyekê dibistanên tirkî boykot bikin. Gelê kurd bi daxwaza 'Em perwerdehiya zimanê xwe dixwazin' ji 20'ê mehê heta 25'ê mehê zarokên xwe neşînin dibistanên tirkî



### DIVÊ BI MAKEQANÛNÊ BÊ MÎSOGERKIRIN

TZPKurdî ji bo li dibistanan perwerdehiya bi kurdî pêk bê ji gelê kurd xwest ku hefteyekê zarokên xwe neşînin dibistanên tirkî û dibistanan boykot bikin. Li ser navê TZPKurdî Adil Ercan diyar kir ku heta nasnameya gelê kurd û zimanê wî bi makeqanûnan neyê parastin tu ewlehiya wê tune ye. Ercan, da zanîn ku her sal bi milyonan zarokên kurd ji ber nebûna perwerdehiya bi kurdî bi stûxwarî dest bi dibistanê dikin.

### HEFTEYEKÊ DIBISTANAN BOYKOT DIKIN

Ercan, bang li gelê kurd kir û xwest her kes piştgiriyê bidin çalakiya wan a boykotê û kes hefteya sereke zarokên xwe neşînin dibistanê û wiha got: "Divê hemû kes, komele, sazî û rêxistinên demokratîk ji bo vê daxwaza perwerdehiya zimanê dayikê daxuyaniya çapemeniyê bidin. Bi vê minasebetê destpêka vebûna dibistanan îsal ji 20'ê îlonê heta 25'ê îlonê zarokên xwe neşînin dibistanê û dibistanan boykot dikin. "... *R.4*



## Katalonya û xweseriya demokratîk

Îro gelê kurd dixwaze pirsgirêka kurd bi rêbaza demokratîk, aştiyane û bi pergala xweseriya demokratîk bê çareserkirin. Tê xwestin ku pergala dewleta yekpare û navendî ji gelek herêmên xweser bê avakirin û gelê kurd jî di herêma xwe de xwe bi xwe rêve bibe. Îro pirsgirêka kurd di rojevê de ye. Bi germahî tê guftûgokirin. Gelê kurd riya herî maqûl nîşan dide. Mînakên herî balkêş û di demên nêz de hatine jiyîn, Katalonya û Îrlanda ne. Pirsgirêka katalonyayê di sala 1979'an de hate çareserkirin. Îro di nava xweseriya demokratîk de dijîn. Îspanya ji 17 herêmên xweser pêk tê... *Nivîsa Hasan OZGUNEŞ* *R.2*

# 'Çemê Zîlanê ji cenazeyan tijî bû'

Çemê Zîlanê bi rojan bi mîtralyozan hate gulebarandin, balafiran bombebaran kir, gund hatin şewitandin. Di rojnameya Cumhuriyetê ya 16'ê tîrmeha 1930'yan de wiha tê gotin: "Li qontarên Agiriyê gundên ku tevli eşqiyaya bûn bi tevahî hatin şewitandin û niştecihên wê li Erdîşê hatin bicihkirin. Di hereketa Zîlanê de zêdetirî 15 hezar eşqiya hatin îmhakirin. Tenê ji aliyê mufrezeyekê tê texmînkirin ku hezar kes in. Di Çemê Zîlanê de 5 eşqiya ji teslîm bûye. Şerê li wir bi tarzekî serkeftî pêk hatiye û Çemê Zîlanê bi cenazeyan tijî bûye." Tiştê ku rojnameya Cumhuriyetê nivîsandine û kesên ku bûne şahidên qirkirinê em bi van re li Erdîşê axivîn tiştê hatine jiyîn bi awayekî aşkera radixîne ber çavan... *Dosya* *R.8*



www.arsivakurdi.org

# Encama referandûmê

## Gel bi vê gavê; bi xêrhatina xweseriya demokratîk kiriye, divê dewlet ji bo şikanandinên nû û zikşewat çênebe; vê baş bixwînin, divê xebatkarê sazkirina civaka gel bi vî gelî serbilind bin

RODÎ ZINAR

Dema ku mirov li rewşa referandûmê dinêre; bi rastî divê mirov hezar carî ji gelê kurd re spasî bibêje ku ev qasî bi diyardeyî xwe bi rêxistinê ve girêdane. Ev qasî polîtîze bûne. Di kesayeta rojane de ev qasî guherîneke bingehîn çêkirine. Ligel hezar astengiyê; nirxa xwe ya cuda derxistine pêş û ji tu fedekariya nereviyane.

Divê siyaseta kurd, divê saziyê kurd, divê zanistê kurd, divê rewşenbîr û nivîskarên kurd, divê xwendekarên kurd, divê gerîlayên kurd, divê ciwanên kurd; spasiya xwe pêşkêşî vî gelê berxwedêr yê efsanewî bike. Ji ber çi;

Dema ku mirov li destpêka referandûmê dinehêre, hêla kurd her çiqas xebata makeqanûnê beyî temsîlkarên wan hatibe meşandin jî; cardin ji ber ku xêrxwaz û aştîxwaz e, li bendî nêzîkbûneke jidil bû, ji ber wî awayî xwe nêzî xebatê dîplomasiyê girt ku dewlet nêzîkbûneke jidil bike; bila bikaribe xwe tevli xebatên guherîna zagonan bike.

Di vê navberê de yê hêla dijî kurd dest bi xebatê xwe yê referandûmê kiribûn û bê navber xebatê xwe didomandin, kurd dixwest hevpariyek çêbibe û nirxê xwe bi diyardeyî dernexist holê û gotin em li bendî erêniyeke mirovahîne, piştî panzdeh roja derket holê ku dewlet tu gava navêje, kesek birîna wan derman nake; biryara xwe ya dermankirina birîna xwe dan.

Panzdeh rojan dereng dest bi xebata referandûmê kirin.

Siyaseta kurd di pey hilbijartina şarwerî re nêzî du hezar endamê partiyê; yê xebatkar ku pirê wan xebatê navendî dimeşandin hatin girtin.

Bi kêmaniya du hezar kadroya dest bi xebatê kirî.

Di partiyeke ji rêzê, an partiya ku kadroyê wê peywira xwe ya fermî bi kar tîne bûna de; tu havil ji wan dernediket, ji ber ku ew ê girtina du hezar endamê xwe bikirina sedem, lê hereketa kurd ev sedem avêt taliyê.

Ji ber ku kadroyê xwe nû kiribûn; heman kadro bi heman bawerî û zaneyê xebata xwe meşandibûn.

Di pêvajoya referandûmê de derket holê ku li Tirkiyeyê du hêl hene. Hêlek dewlet e; ev dewlet navê xwe guheriye û niha di bin sîwana ola siyasî ku navê wê AKP e ye de xebatê dike, dema ku dijberê te dewleteke nijadperest be; nêzîk bûn û bi kar anîna amûra, ew ê li gori derfetên dewletê bi kar bîne.

AKP jî wisa kirî, gef li gel kirî ku ew ê kartê wan yê kesk yê ji bo alîkariya tendurustiyê tê bikaranîn; bên betalkirin.

Însanên xebatkar cardin hatin girtin. Panzêr an wesayitê leşkerî yê giran ji bo gefdanê li kuçe û herêma sindoqên dengdayinê digeriya. Walî, Qeymeqam, Fermandarê leşkerî giştika aliyê xwe diyar kirin û xwestin ku gel biçî dengê xwe bi kar bîne.




Li gundê beriyê ku bandora gerîla lê kêm çêbûye; em dizanin ku di warê civaknasî de; ji ber têkiliyê feodalî; jin ne xwediyê biryarane û mêr dengê wan bi kar tîne.

Mînaka herî balkêş di 1992'yan de li Şirnexê bû; dema ku bi êrîşeke li dijî mirovahî rû bi rû ma; Şirnex hatibû xerakirin û valakirin; li bajêr hew malê cerdevanan niştecih mabû, di wê hilbijartinê de cardin dayik û insanê wijdanê wan qebûl nedikirin ji sedî bîst û du deng dabûn hêza tevgera azad.Li van gundê beriyê çiqas têkiliyê berjewendî û tirsê hebin jî; ew ê heman encam derketa holê, lê dengê yekparê tê wê wateyê ku sextekarî tê de heye.Ev cara yekemin e ku tilî (bêçî) nayê boyaxkirin, peywirdariyê ewlehiyê pirê wan ji derve hatibûn û tevahî peywirdaran li çend cihan dengê xwe bi kar anîn, ev sextekarî li Amedê hate tespîtkirin, ji xwe cihê deng lê têne dayin di bin dorpêçkirina kesên ewlekariyê de bû.

Li dijî nêzîkbûneke wisa gel neçûn ser sindoqan, esnafan neçûn dikanê xwe venekirin û derketin seyranê.

Di encama referandûmê de derket holê ku tevahî cerdevanan deng nedane rayedarên fermî û nêzîkbûna dewletê erênî nekirine. Divê tiştekî dinê jî ji bîr nebe ku her kes dikare ji şaşiyê vegere, an her kes ne ji bo dijminiya gel bûne cerdevan, bê dîtin.

Em ji cerdevanên xwe dikin parêzerê dewleta netewperest û êrîşî gel dike dibêjin fedî bikin û li dîrokê binêrin; em baş dizanin ku mêzîna jiyanê xera bibe; berê hûnê êrîşê bibin ser dewletê, lê tevgêra azad naxwaze mêzîna jiyanê xera bibe ku ji bin hilweşandinê jiyaneke nû afirandin zehmet e û dixwaze berî ku jiyan hilweşe; dewletê bîne rê û mafê gelê kurd ê insanî bidê, ev jî bi alîkariya tevahî gel e.

Ev hereketê we pêvajoyê naguhere û rûreşiya we ew ê ji we re bimîne, ji ber ku encama dihate xwestin gel bi dest xist.

Hin nivîskar an rewşenbîrê bi ser mistdanê, bi tilîyeke hingiv hezar carî evînî dibin re dibêjim li xwe hay bibin û bibînin ku hûn bi ser eniya kurd re radigirin.

Eniya ku mafê gelê kurd nadê û bi dijwarî, qetil kirin bi ser gelê kurd de tê eniya dewletê ye, divê berê we bi ku ve bûna; berê we bi ku ve ye? Xwe bibînin û ji xwe fedî bikin.

Ez dibêjim ne ji canfeda û cangoriyan bûna; hêna hûnê di kuçê Ewropa de sêwî sêwî bigeriyana.

Hûn baş dizanin ku mezinê we bi dengê potîna reviyan Ewropa, li kêfa xwe nihêrîn, mezinên we difikirîn ku ew ê mîna derbeya 70'î efûya giştî derkeve û ew ê vegerin welêt, xebatên xwe yên mîna holîka zaroka bidomîne, lê vê carê cudabû û hin dildarê mirovahiyê, li bendî nezana nesekinî û bê navber li ser dana canê xwe, ji bo rojên îroyîn xebatê xwe domandin, ev pêvajo bi fedekariya wan cangoriya hatiye afirandin, ya na dewletê tu maf nedida kurdan, ger ku çavên we saxlem be hûnê baş bibînin.

Ji dêvla deyndariyê hêj hûn ji rewşenbîr û ronakbîrê dewletê tûjtir êrîşî eniya gel dike sedem çi ye?

Êrîşa dewletê tê fêmkirin ku dibêje em dewlet in û çawa hûnê di nava çavên me de xwe bi rêxistin bike û bi serbikevin, lê hûn? Hesûdiya we, dexsiya we ji bo çi ye? Neynikê deynin hemberî xwe li xwe binêrin ku rewşa we çi ye, kes an gelê berxwedêr dîrokê dinivîse yên dinê ji bo mînakên neyînî têne şîrovekirin vê bizanibin.

**Divê ev encam çawa bê xwendin.**

Gel bi xebateke hindik be jî biryara xwe ya yek dengî, yek gewdeyî, biryareke hevpar, li dijî hemû gef, astengî, pêkutî û girtinê dibêje em hene û divê dost û dijmin bi hevdu re bibînin ku êdî gelê kurd ne gelê berê ye ku kone wan bixapîne û xwediyê rêxistineke fedekarî ku rêxistin çi biryarê bide; em li dû biryara rêxistina xwe ne.

Gel bi vê gavê; bi xêrhatina xweseriya demokratîk kiriye, divê dewlet ji bo şikanandinên nû û zikşewat çênebe; vê baş bixwînin, divê xebatkarê sazkirina civaka gel; bi vî gelî serbilind bin, divê yên li dijî vê eniya gel; mîna rayedarên dewletê, ji vê biryara gel re rêzdar bin.

Ji niha û pêde, kadro, xebatkar, sazî, kes, dildarên xebatê ji bo domdirêjiya agirbestê ya dualî û wekheviyeke bi rûmet xebata xwe bi alîkariya gel û di heman zîrekiyê de bidomîne ku xebat bi taca zêrîn encam bibe.

Kes an saziyên agirbest xwestibûn; divê civîn li ser civîna çêbikin, divê rola xwe ya diplomasiyê bileyize, divê dilê hişk nerm bikin ku gorî xwesteka wan agirbest pêk hatibû û di vê navberê de cardin dayikê kurd giriyabûn, ev webalekî mezine û di bin vî webalî de nemînin.

Divê li gorî wê hêviyê encam derkeve holê.

Ji bo referandûmê Ji gelê berxwedêr û qehreman ku ev roja şanenazî bi me daye jiyandin spas û serkeftin ji we re.

---

Hasan Ozguneş
hasanozgunes@hotmail.com



## Katalonya û xweseriya demokratîk

Îro gelê kurd dixwaze pirsgirêka kurd bi rêbaza demokratîk, aştiyane û bi pergala xweseriya demokratîk bê çareserkirin. Tê xwestin ku pergala dewleta yekpare û navendî ji gelek herêmên xweser bê avakirin û gelê kurd jî di herêma xwe de xwe bi xwe rêve bibe.Belê mixabin desthilatdarên tirkan bi nêrîneke ew qas nijadperest, nenasker û statukoperest hatine xemilandin ku tu çi mînakê jî kî dera cîhanê nişan bidî û bikî mînaka çareserkirinê dê bêjin ev li gorî rewşa me nîn e û nabe. Ji ber ku karê wan berevajîkirina rastiyane. Her tiştî jî eslê wî dûr dixin û li gorî berjewendiyên xwe diafirînin û dibêjin rastî ev e.

Ber hindê heyştê û şeş sal in pirsgirêka kurd nehatiye çareserkirin. Tenê riya tepisandin û tunekirinê fêm kirine. Ew jî heta niha ser neketiye û bi ser jî nakeve.

Îro pirsgirêka kurd di rojevê de ye. Bi germahî tê guftgûgokirrin. Gelê kurd riya herî maqûl nîşan dide. Mînakên herî balkêş û di demên nêz de hatîne jiyîn, Katalan û Îrlanda ne.

Pirsgirêka katalonê di sala 1979'an de hate çareserkirin. Îro di nava xweseriya demokratîk de dijîn. Îspanya ji 17 herêmên xweseriya demokratîk pêk tê.Katalonan bi kurtî ser van xalan bi dewleta Îspanyayê re li hev kirin:

**Xala 1;**

**1.** Katalonya wekî neteweyekê dê ser esasê destûra bingehîn xwe di herêma otonom de bi xwe rêve bibe û bi rêxistin bike.

**2.** Hikûmeta xweseriya demokratîk, saziya polîtîk a herêma Katalonyayê ye.

**3.** Hêza hikûmeta xweseriya demokratîk jî destûra bingehîn, statuya heyî û gel tê.

**Xala 2 ;** Xaka Katalonyayê ji herêma bajarên Barselona, Gîrona, Ljeîda û Taragona pêk tê.

**Xala 3;**

**1.** Zimanê xweser ê Katalonyayê katalonî ye.

**2.** Zimanê katalonî bi zimanê îspanyolî (Castîlanî) re li her derê Îspanyayê fermî ye.

**3.** Hikûmeta Xweser ji bo perwerdeya her du zimanan çi pêwîst be dê bike. Ji bo maf û peywirên welatiyan û wekheviya wan dê hemû şert û merc bêne pêkanîn û her du ziman bêne bikaranîn, dê derfet bi misogerî bêne afrandin.

**4.** Dê zimanê Aranî bê parastin û perwerdeya wê bê kirin.

**Xala 4;** Alaya Katalonyayê bi kevneşopiya heyî re ji çar şerîdên sor ên li ser bingeheke zer e.

**Xala 5;**

**1.** Hikûmeta Katalonyayê rêxistina xwe ya herêmî ji hêla herêm, bajar, bajarok û navçeyan de dikare ji nû ve saz bike.

**2.** Wekî din li gorî taybetmendiyên herêman dikare ji nû ve herêman bi ser hevde ji nû ve saz bike.

**3.** Li gorî zagonên heyî xweseriya Katalonyayê dikare zagoneke nû ji parlamentoya herêmî derxe û herêmên xweser ên cur be cur ava bike û bixe bin misogeriyê.

Bêguman zagonên nava dewleta Îspanyayê û herêma xweser a Katalonyayê ne ev tenê ne. Belê di çend xalên esasî de xuya dike ku gelê Katalon di nava sînorên Îspanyayê de mafên xwe ên ji gelbûnê tên bi kar tîne û xwe bi xwe rêve dibe. Gelê kurd jî bi salan e ji bo welatekî demokratîk, azad têkoşînê dide. Dixwaze bi awayekî azad xwe rêve bibe û mafên xwe ên gerdûnî jî bijî. Mixabin dewleta tirk ji înkar û îmhayê heta niha jî dest bernedaye. Hêvîdarim ku bi gur û geşkirina têkoşîna gelê kurd û dostên wan dewlet bê ser riya rast û ev pirsgirêk wekî mînakên li dinê bê çareserkirin û ev şer raweste, aştî serdest bibe…

---

## XAÇEPIRS


**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Dijbera çepê **2.** Genimê hêrandî... Mêweya ku hîna kal û xang e û nayê xwarin **3.** Bêjinga ku dexlê ji hev diqetîne **4.** Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Dîwarê ku ji xaliyê hatiye çêkirin 5. Kar û xebat... Alif, xwarina sewalan **6.** Kurteya beriya zayînê... Sir, tiştê her kes pê nizane **7**. Notayek... Şexs **8.** Dengdêrên "pêça"yê... Vê carê **9.** Benê zîrav ê ku li keştiyan pê alayê bi dîrekan ve datînin... Beyreq, sembola welatan

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Nexweşiyek... Pirsek di rewşa ne tewandî de... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin **2.** Keştiyê ku berê bayê lê ye... Tevgera hewayê **3.** Peyveke teşwîqkirinê... Îşaret, şop... Vexwarina sereke **4.** Dijberê rengî spî... Li hin cihan beramberî heşt û li hin cihan jî beramberî şazdeh welçekan e **5.** Encam, netîce... Rastêşek **6.** Hêjmarek... Notayek **7.** Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Temen... Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin **8.** Plakaya navneteweyî ya Iraqê... Helale, **9.** Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Firaqa ji gil...Yezdanekî misrî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | L | Ê | K | D | A | N | | K | A |
| 2 | A | | Û | R | | A | D | E | M |
| 3 | L | A | P | A | Z | | O | J | E |
| 4 | | L | | M | A | S | T | | T |
| 5 | Ş | A | M | | L | O | | A | A |
| 6 | Î | N | | Ç | | R | O | J | |
| 7 | R | | R | E | Ş | | T | O | L |
| 8 | E | C | E | L | | T | O | | E |
| 9 | T | A | | P | Ê | R | | E | M |



www.arsivakurdi.org

# Cenazeyên 3 gerîlayan wergirtin

## Malbatên 9 gerîlayên HPG'yê yên li çoltera Colemergê ligel meha Remezanê û rewşa bêlakîtiyê di êrîşa Artêşa Tirk de jiyana xwe ji dest dan li Meletiyê cenazeyên xwe digirin û bi bertekên mezin qetlîam tê şermezarkirin

**MELETÎ / DÎHA** - Ji 9 cenazeyên gerîlayên HPG'ê yên di operasyona 6'ê îlonê de li Colemêrgê jiyana xwe ji dest dan, cenazeyên Ulaş Bozan (Şoreş Agirî) û Beytullah Ozkan (Cesur Colemêrg) ji aliyê malbatan ve hatin wergirtin.

Ji 9 cenazeyên gerîlayên HPG'ê yên di operasyona di 6'ê îlonê dê li çoltarên Gole Hasane, Çiya Reşke, Bileh, Binevş, Zerzengule, Baleka, Sirte Dohula û Mebirnav ên di navbera Wan û Colemêrgê de dimînin dest pê kir de jiyana xwe ji dest dan 3 cenaze ji aliyê malbatan ve hatin girtin. Cenazeyên li Saziya Tibê ya Edlî ya Meletê tên sekinandin, Malbata gerîlayê HPG'ê Musab Doman (Zagroz Bawerî) cenaze wergirt û bir navçeya Panosa Agiriyê.

Malbatên gerîlayên HPG'ê Ulaş Bozan (Şoreş Agirî) û Beytullah Ozkan (Cesur Colemêrg), serî li dozgeriyê da û cenaze girtin. Hate zanîn ku cenazeyê Bozan li Colemêrgê yê Ozkan jî li gundê Şemê yê navçeya Tutaxê dê bên veşartin.

**Li Amedê pêşwaziya girseyî**

Malbatên din jî ji bo cenazeyan bigirin serî li dozgeriyê didin û hate hinbûn ku cenaze dê li Amedê bi girseyî bên pêşwazîkirin. Hate zanîn ku cenazeyên HPG'iyan dê li daketina Erxaniyê bên pêşwazikirin û bi konvoyê bînin Amedê û li vir jî dê bi girseyî ber bi bajarên wan ve rêbikin.




## Li Wanê ji bo gerîlayan konê şînê

**VAN / ANF** – Ji bo gerîla Ferman Ozlu û Recep Kutlarê ku li Colemêrgê jiyana xwe ji dest dan li Wanê konê şînê hat vedan. Li Navçeya Qerqeliya Wanê esnaf derabeyên dikanan venekirin û êrîşê şermezar kirin, li Giyadînê jî ciwanan agir hilkir û dirûşme qêriyan.

Li herêma Bileh û Binevşan ya gundê Aksu ya Colemergê roja 6'ê îlonê 9 gerîla di êrîşa Artêşa Tirk de jiyana xwe ji dest dan û ji bo gerîla Ozlu û Kutlarê ku navan ne gerîlayan de ne û jiyana xwe ji dest dane li taxa Hacîbekîr ya Wanê Konê şînê hat vedan. Konên taziyeyê cihê cihê hatin vedan. Gele bi girseyî çû şîna gelayan û di ligel girseyê Parlamentera Wanê Fatma Kurtulan, Şaredarê Wanê Bekir Kaya, Hevserokê BDP'yên Wanê Cuneyt Caniş, Feyziye Şîran jî çûn şîna gerîlayan. Di konan de wêneyên gerîlayên jiyana xwe ji dest danê û wêneyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin daliqandin. Piştî serxweşiya şînê ya malbatên gerîlayan kirin girse ji kona şînê veqetiyan. Ancax gel ref bi ref diçin konên şînê.

**AGIRÎ :** Komek ciwanên ku li taxa Ketampinarê ya navçeya Giyadîna Agiriyê kom bûn operasyonan li Colemêrgê şermezar kir. Komê, piştî agir hilkir, sloganên "Tolhildan", "Şehîd Namirin" û "Bijî Serok Apo" berz kirin. Piştî komê dest bi meşê kir, rastî êrîşa polîsan a bi bombeyên gazê û ava şid hatin. Ciwanan jî bi kevîran bersiva polîsan da û heta derengê şevê bûyeran berdevam kir.

**WAN :** Li Elbaka navçeya Wanê esnafan ji ber operasyonên leşkerî yê Artêşa Tirk ku pêk tîne û qetilkirina gerîlayên HPG wekî bertek derabeyên dikanên xwe venekir. Li herêma Bîleh û Binevşan a Celemêrgê ku di encama operasyona Artêşa Tirk a di dema rewşa bêçalakiyê ya HPG'ê de pê hatibû û 9 gerîlayên HPG'ê jiyana xwe ji dêst dabû esnafên Elbakê protestokir û derabeyên dikanên xwe venekirin. Her wiha hate ragihandin ku esnaf girtina binçavan û şewata daristanan jî protesto dikin.

## Ji HPG'ê 3 çalakiyên bersivdayînê

**Sînan CUDÎ - BEHDÎNAN /ANF**

Li gel bêçalakîtiyê û meha Remezanê operasyon û êrîşên artêşa tirk bê ku raweste dem kir û HPG'ê jî li dijî vê êrîşkariyê 3 çalakiyên bersivdayînê pêk anî. Di van çalakiyên bersivdayînê de 12 leşkerên tirk hatin kuştin.

Roja 6'ê îlonê li çoltera Colemergê 9 gerîlayên HPG'ê di operasyona û êrîşa artêşa tirk de jiyana xwe ji dest dabû. Piştî vê HPG'ê çalakiya bersivdayînê pêk anî. HPG'ê berya vê jî bi daxuyaniyek aşkera kiribû ku ew dê tola gerîlayên hatine qetilkirin dê hildin.


Çalakiya destpêkê li gundê Nivila ya navçeya Dihê ya Sêrtê pêk hat. Di vê çalakiyê de bi roja 11'ê îlonê bi ser qereqola gundê Nivilê re hat girtin çalakî saet di 15.30'yan de pêk hat. Li ser mijarê Navenda Çapemeniya HPG'ê (BÎM) daxuyanî da. Hat gotin ku leşekêrê ku bi tankêrê ava qereqolê temîn dikir û 200 metre nêzî qereqolê bû 5 leşkerên di wesayîtê de hatine kuştin û tankêra avê jî hatiye îmhakirin. Çalakiya bersivdayînê ji aliyê yekîneya Şehît Rizgar ya HPG'ê ve bi boneya tolhildana gerîlayên li Colemêrgê jiyana xwe ji dest dane pêk anîne. Di daxuyaniyê de tê diyarkirin ku roje piştî yanî roja 12'ê îlonê artêşa tirk dest bi operasyonê kir. Operasyon heman rojê dana êvarê bidawî dibe û artêşa tirk paşve vedikişe.

Gerîlayan çalakiya bersivdayînê ya duyemîn jî li gundê Setkarê ya navçeya Elkê ya Şirnexê pêk tê. Ev çalakî roja 12'ê îlonê li dijî leşkerên ku tepe girtine pêk tê. Çalakî saet di 10.00'an de pêk tê. Girê ku di nav gundê Setkarê û Elkê de cih digire û ciheke stratejîk e gerîla bi serda digirin. Di biserdagirtinê gerîlayan de 1 jê cerdevan bi giştî 6 leşker hatin kuştin û yek jê cerdevan 3 leşker jî birîndar bûn.

Piştî çalakiyê operasyona ku artêşa tirk heman rojê de da destpêkirin piştî demeke kurt bê ku tu encam bidest bixe paşve vegeriya.

Bersivdayîna 3'yemîn jî li Dihê pêk hat. Di vê çalakiyê de jî girê Misesra ya ku bi kêmanî 20 leşker lê diman hedef hat girtin. Gerîlayên HPG'ê roja 12'ê îlonê bi ser girê Misesra digire.

BÎM'ê diyar kir ku roja 12 îlonê saet 08'an de çalakî pêk hatiye. Di encama çalakiyê de derbarê kuştî û birîndaran de tu agahî nehatiye bidestxistin. Ancax medaya tirk destnîşan kir ku di vê çalakiyê de leşkerek hatiye kuştin. BÎM'ê aşkera kir ku vê çalakiyê jî di çarçoveya bikaranîna mafê bersivdayînê de pêk hatiye.



## Turanê 15 salî hêj di komayê de ye

**WAN / DÎHA** - Enver Turan ê 15 salî ku bi guleya çawişek pispor bi giranî birîndarbû hêj talûkeya mirinê ji ser xwe neavêtiye.

Rewşa zarokê birîndar ê 15 salî Enver Turan ku li Colemêrgê bi guleya çawişê pispor bi giranî birîndar bû hêj talûkeya mirinê ji ser xwe neavêtiye. Turan, li Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Wanê dimîne hê jiyana wî di talûkê de ye. Bijîşk Dogan Erogullari, nûçeyên der barê Turan ên "mirina bejiyê wî temam bûye" derew derxist û diyar kir ku mirina mejî pêk nehatiye lê talûkeya wî ya mirinê hê jî didom e.

Erogullarî, bal kişand ku Turan ji hêla 2 bijîşkan ve tê dermankirin û wiha got: "Rewşa nexwê hêj giran e. Çi ji destê me bê em zêdetirê dikin. Gotinên 'mirina mejiyê wî temam bûye' ne rastin. Nexweşê me bi alîkariya derman û makineyan jiyana xwe didom e." Malbata Turan diyar kir ku li ser rewşa wî tu pêşketin çênebûne û carinan dikarin wî ziyaret bikin.

Çawîşê pispor li Colemergî li cihê ku çalakî nebûn ji wesayîte xwe ya taybet peya dibe û biz anîn Enver Turan dike hedef û bi çeka xwe xwe gule bara wî dide. Çawişê pispor yê ku gule berî Enver Turan dide piştî du rojan bi hinceta birîndarkirina mirov dozger biryara girtinê ji bo wî derxist û wî şandin girtîgeha leşkerî.

## Hefteya krîtîk dest pê kir

**M. DIREWŞ / BRUKSEL**

Bi dawîbûna referandûmê, niha hefteyeke krîtik dest pê kir.

Ji bo bi dawîbûna dema bêçalakîtiya leşkerî ya KCK'ê tenê hefteyek ma.

Ji niha û pê ve hemû awir zivirîn ser hikûmeta AKP'ê û dewleta tirk.Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê û Kongra Gel, di 13'ê Tebaxê de, ji bo şansek bidin hewldanên çareseriya demokratîk biryara bêçalakîtiya leşkerî îlan kirin.

Ev biryara KCK'ê bû sedema kêfxweşiyeke mezin û zêdebûna hêviya çareseriya demokratîk.Lê belê dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê li şûna ku bersiveke erênî bide biryarê, di siyasetên şer de israr kir..

Tevî ku gerîlayên HPG'ê bi disîplîneke mezin li gorî biryara bêçalakîtiyê tevgeriyan jî, rastî êrîşên hêzên tirk hatin û zêdetirî 20 gerîlayan jiyana xwe ji dest da.

Herî dawî hêzên tirk bi pêşengiya Fermandarê Hêzên Bejayî di 6'ê îlonê de li Colemêrgê 9 gerîlayên HPG'ê qetil kirin. Tevî vê komkujiyê derdorên banga agirbestê kirin û derdorên nêzî hikûmetê referandûm wekî sedem nîşan dida û bêdeng diman. Niha referandûm qediya û bi vê yekê jî pêvajoya krîtîk ya heta 20'ê îlonê dest pê kir. Eger hikûmeta AKP û dewleta tirk heta 20'ê îlonê gaveke ji bo çareseriyê neavêje, wê pêvajoya bêçalakîtiyê bi dawî bibe. Ji ber vê jî hemû awir zivirîne ser hikûmeta AKP'ê û dewleta tirk.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî di hevdîtina dawî de girîngiya vê pêvajoyê anîbû ziman û gotibû, dê heta 20'ê îlonê her tişt zelal bibe. Ocalan gotibû, ger heta wê demê pêşketinek nebe, dê êdî ji tiştên biqewime ne berpirsyar be.

### KURTE NÛÇE

## Li Salmasê teqîn: 4 leşker mirin

SELMAS

Hat ragihandin ku li bajarê Selmasê rojhilatê Kurdistanê mayinek teqiya û di encamê de 4 leşkerên rejîma Komara Îslamî ya Îranê hatin kuştin û 5 leşker jî bîrindar bûn. Li gorî agahiyan dema karwanê leşkerên Îranê li Selmasa Rojhilatê Kurdistanê derbas dibûn teqînek pêk hat. Di encamê de 4 pasdarên artêşa Îranê hatin kuştin, 5 leşker jî birîndar bûn. Artêşa Îranê di meha tebaxê de hêzên xwe li ser sînor kom kiribû û Herêmên Parastinê yên Medyayê bi hewan û fuzeyên katuşa topbaran dikir, ji destpêka meha îlonê ve hêzên xwe ji sînorê başûrê Kurdistanê vekişand. Piştî Artêşa Îranê yekîneyên xwe ji sînor vekişand, jiyana li ser sînor vedigere rewşa xwe ya asayî. Piştî mehekê gundiyên Başûrê Kurdistanê ku debara wan li ser xwedîkirina ajalane, careke din berê xwe dan zozanan. Gelê herêmê ji bo baxçe û baxên xwe ji nû ve çêbikin vegeriyan.

## Çûn serdana malbatên PJAK'Î

SINE

Komek parêzvanên mafê mirovan û xizmên girtiyan çûn serdana malbatên gêrîlayên meha gulana derbas bûyî hatîn bidarvekirin. Koma ku çû serdana malbatên Ferzad Kemanger, Ferhad Wekîlî û Alî Heyderiyan yên li Sineya rojhilatê Kurdistanê û daxwazên xwe yên piştgiriyê ji wana re ragihand. Dayika Ferzad Kemanger Saltenet Rezai jî ji bo serdana malbata Wekîlî û Heyderiyan bû. Gelek kes ji bo serdana Cejna Remezanê çûn serdana malbata Şîrîn Elam Holî ya li Makoyê jî. 4 girtiyên PJAK'î di meha gulana derbas bûyî de li Girtîgeha Evînê ya li Tehranê hatibûn bidarvekirin.

## Du rojnamegerê kurd hatin girtin

MÊRSÎN

Nûnerê Rojnameya Azadiya Welat ê Mêrsînê Abddulcabbar Karabeg û Alî Çat hatin girtin. Xebatkar û nûnerê Rojnameya Azadiya Welat ên Mêrsînê Abdulcabbar Karabeg û Alî Çat, ku hatibûn binçavkirin piştî derxistin pêşberî Dadgeha Nobedar a Mêrsînê bi îdiaya "propoganda rêxistinê kirine" hatin girtin. Çat û Karabeg pişt re şandin girtîgeha Tîpa E ya Mêrsînê.

# TZPKurdî, ji bo perwerdehiya zimanê dayikê got 'Boykot'

## TZPKurdî, bi armanca perwerdehiya li dibistanan bêyî kurdî tê dayîn boykot bikin li Navenda TZPKudî daxuyanî da û xwest gel hefteya destpêkê ya perwerdehiyê dibistanan boykot bikin



**AMED / DÎHA -** Adil Ercan li ser navê TZPKurdî axivî û diyar kir ku dibistan hefteyek ji bo perwerdehiya zimanê dayikê bê boykotkirin. Ercan bang li gelê kurd û derdorên demokrat kir ji bo piştgiriyê bidin vê biryarê.

TZP-Kurdî ji bo perwerdehiya zimanê dayikê biryara 'Boykot'ê girtibû. TZP-Kurdî, ji bo vê biryarê aşkere bike li Navenda TZPKurdî daxuyaniyek da çapemeniyê. Li ser navê TZPKurdî Adil Ercan dauyanî xwend û diyar kir ku heta nasnameya gelê kurd û zimanê wî bi makezagonan neyê parastin tu ewlehiya jiyana wî jî nin e. Ercan wiha got:" Ev 88 sal in dewlet kurdan ji nedîtî dibine, gelê kurd di demên herî hesas de mîna Şerê Rizgariya Tirkiyeyê, Qore, Qibris û hwd. de di çepera heri pêşin de cî girtiye. Kurd peywirên xwe bi her hawî bi cî aniye lê dewlet peywirên dikeve ser milê xwe tu tiştek bi cî neaniye." Ercan axaftina xwe wiha domand:" Ji bo dewletê kurdên ker, lal-bê ziman, kor, hov-xeşim yanê mirî pêwîst e. Heke ziman jî bê qedexekirin bi zagon û makezagonan were dorpêçkirin, qufileke kor were miftekirin êdi çi mafê jiyanê ji gelê kurd re dimine! Êdî tu hêviya gelê kurd ji dewletê nemaye. Êdî gelê kurd xwe bi xweseriya demokratîk rêxistin dike. Divê dewlet xweseriya demokratîk qebûl bike. Her sal dema dibistan vedibin bi milyonan zarokên kurd stuxwar diminin. Nikarin bi zimanê xwe perwerde bibinin. Êdî temenê pişaftinê jî daketiye 2 salan. "

**'Pişaftin sûcê mirovahiyê ye'**

Ercan da zanîn ku Serokwezîr dibê "pişaftin sûcê miravahiyê ye", lê bi pêşdibistanan zarokan ji ber pêsira dayikên wan dikin û bi jiyana wan dilîzin. Serokwezîr van jî ji nedîtî ve tê û nibîne.

## Daxwazên TZP-Kurdî

Ercan, daxwazên TZP-Kurdî rêz kir û wiha berdewam kir:

- ✓ Ji bo zarokên xwe ji dest bernedin, winda nekin çu kes zarokên xwe yên biçûk hetanî 6 salî neşînin pêşdibistanên bi tirkî. Ku ew der aşê pişaftina zimanê dayikê ye.
- ✓ Her malbat ji bo van zarokên xwe yên biçûk û yên diçin dibistana seretayî heta yên ku biçin zanîngehê (18 salî) daxwaza perwerdehiya zimanê dayikê bikin daxwazname bidin saziyên dewletê yên peywendidar.
- ✓ Xwendekarên zanîngehan jî ligel boykotkirina heftekî dibistanan daxwazname bidin heman saziyên dewletê ku dazwaza perwerdehiya zimanê dayikê bikin.
- ✓ Divê hemû kes, komel sazî û rêxistinên demokratîk ji bo vê daxwaza perwerdehiya zimanê dayikê daxuyaniyan çapemeniyê bidin. Bi vê minasebetê destpêka vebûna dibistanan îsal ji 20'ê îlonê heta 25'ê îlonê li ser daxwaza "EM PERWERDEHIYA ZIMANÊ XWE DIXWAZIN" vê helwesta dewletê ya nehiqûqî û nemirovane napejirînin û dibistanan boykot dikin. "

Ercan, bang li gelê kurd kir û xwest her kes piştgiriyê bidin çalakiya wan a boykotê û kes hefteya sereke zarokên xwe neşînin dibistanê.

# 'Em statuya Katalonyayê dixwazin'

**BEHDÎNAN / ANF -** Serokê Konseya Rêveber ya KCK Murat Karayilan got ku ger ew jî statuyekî wekî Katalonyaya Îspanyayê otonomiyeke berfireh bidest bixin ew ê hemû çekên xwe radestê NY'yê bikin.

Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan ji rojnameya El Mundo ya Îspanyayê re axivî û diyar kir ku ew di warê otonomiyê de li modeleke weke ya Îspanyayê digerin. Karayilan diyar kir ku wana destûra bingehîn ya Îspanyayê lêkolîn kiriye û bal kişand ku li gorî asta guhertinên herêman otonomî hatiye dayîn.

Karayilan got; "Hikûmetên herêmî bi ya navendî re di nava hevsengiyekê de ne, hêzên xwe yên polîs û parlamentoya xwe bi xwe hene, dê modeleke wiha bê şopandin".

Karayilan got; "Ger em jî otonamiyeke weke Katalonyayê bi dest bixin, em ê çekan deynîn û radestê Neteweyên Yekbûyî bikin" û bibîr xist ku dê agirbest heta 20 îlonê bidome. Karayilan hişyariyeke wiha kir; "Lê ger êrîş û girtin berdewam bikin, wê demê em ê neçar bimînin ku stratejiyê biguherînin û dawî li agirbestê bînin."

# Li Amedê civîna 'bêçalakîtiyê'

**AMED -** Rêxistinên civakî yên sivîl ên Amedê ku di nav 649 rêxistinên sivîl ên civakî yên banga bêçalakîtiyê li PKK'ê kirin de cih digirin, ji bo ku bi rayedarên dewletê re hevdîtinê bikin dicivîn.

Rêxistinên civakî yên sivîl ên Amedê yên ku banga agirbestê li PKK'ê û dewletê kirin û PKK'ê bi awayekî erênî bersiva wan da, îro bi rojeva "bêçalakîtiyê" li Amedê kom dibin. Di dema bangê bêçalaktiyê kirin gotibûn "Berpirsiyariya dikeve ser milê me em dê bikin û amadene" lê ligel biryara bêçalaktiyê di operasyonan de 20 gerîlayên HPG'ê jiyana xwe ji dest dan û bêdengiyan wan li herêmê rastî bertekan hat. Rêxistinên sivîl ên civakî yên Amedê îro dê bi rojeva "Bêçalakîtiyê" dê bicivin. Hate zanîn ku rojeva civînê bêçalakîtî, rawestandina operasyonan, muzeker û diyalog dest pê bike, dê dîroka bi rayedarên dewletê re hevdîtinan bikin diyar bikin.

Rêxistinên sivîl ên civakî berî referandûmê bi rayedarên hikûmetê hevdîtinên kirin bersiva mijarê ji bo piştî referandûmê bihêlin girtibûn. Sazî, niha li benda bersivekî çawa dê bê dayîn in. Berî referandûmê Wezîrê Karê Hûndir Beşîr Atalay bi rêxistinên sivîl re hevdîtin kiribû û li gorî dengên erê soz dabû. Niha helwesta hikûmetê ya li dijî bêçalakîtiyê û dê çi bersivî bide rêxistinên sivîl ên civakî mijara meraqê ye. Baroya Amedê, Odeya Pîşe û Bazirganiya Amedê, KESK, Odeya Tabîbên Amedê û gelek nûnerên rêxistinên sivîl ên civakî dê di civîna îro de ji bo randevuyê ji Serokwezîr û Serokomar bigirin biryarê bigirin. Tê gotin ku 649 rêxistinên sivîl ên civakî dê 16'ê îlonê dê daxuyaniyê bidin. Piştî daxuyaniyê nûnerên rêxistinên sivil ên civakî dê 17'ê îlonê biçin Enqereyê.

# 'Encam îlankirina xweseriya kurdan e'

**ENQERE / STENBOL -DÎHA**


















Bi encambûna referandûmê re nîqaşên li ser encama referandûmê zêde bûn. Her çiqas alîgir û kelemşorên AKP'ê bi zimanekî tûj BDP'ê û gelê kurd ên referandûm boykot kir û neçû ser sindoqan rexne û tawanbar bike û BDP'ê û gelê kurd wekî alîgirê "kevneperestiyê" îlan bike jî dîsa gelek rewşenbîr û demokrat encmama boykotê girîng û erênî dibînin. Nivîskar û rewşenbîrên encama referandumê ji DÎHA'yê re vegotin diyar kirin ku bi vê hilbijartinê derket holê ku beyî vîna kurd pirsgirêk çareser nabe

**Nivîskar Temel Demîrer**: Referandûmê du encamên girîng aşkera kir. Di vê referandûmêde AKP bi ser ket. Li aliye din yê winda kir dewleta TC'ê ye. Perçeyekî vê yekê nijadperestên kevneperestin. Perçeyek jî aliyê îslama lîberal ên Fetullahçî ne. Perçeyê sêyem jî eniya boykotê ye.

**Oral Çalişlar**: Bi vê referandumê civaka Tirkiyeyê helwesta xwe ya ji bo aştî, demokrasiyê bi awayekî zelal nîşan da. Dibe di pêşerojê de Tirkiye bêtir ber bi demokrasiyê ve bimeşe. Di vê hilbijartinê de AKP û BDP bi ser ket. Yê winda kir jî MHP ye. Divê êdî AKP bi hêzek mezindir pirsgirêkan çareser bike. Bi vê hilbijartinê aşkere bû ku bêyî vîna gelê kurd pirsgirêk çareser nabe. Ji bo çareseriyê divê daxwazên BDP'ê û gelê kurd li ber çavan bên girtin. Divê Tirkiye li şûna Talabanî û Obama bi gelê kurd û pêşengên gelê kurd re têkeve nava diyalogê.

**Mesut Yegen:** Du encamên girîng ên referandûmê hene. Aliyekî vê feraseta AKP'ê ye, aliyê din daxwaza hilbijêrên gelê kurd e. Daxwazên endamên BDP'ê ya Xweseriya Demokratîk daxwaza min e jî. Daxwzên zimanê zikmakî, çand û xweseriya demokratîk mafên demokratîk û rewa ne. Di vê hilbijartine de gelê kurd got xweseriya demokratîk.

**Mîthat Sancar:** "Encamên referandûmê daxwaza ku ji bo siyaseteke demokratîk dikir, derxist holê. Ez encama tercîheke bi hêz dibînim. Ez vê yekê dibînim ku propogandaya neteweyîtî ya Tirkiyeyê di her mijarê de têk diçe. Divê girîngiya siyasî ya Boykotê bê nîqaşkirin. Ev zehmet e ku mirov ji pirsa alîkariya wê çêbûye re bibêjin erê. Lê Boykotê barê BDP'ê hêsatir kiriye. Ger ku 'Na' derketiba dê fatureya wê ji bo BDP'ê gelek giran bûya. 'Erê' jî bar sivik dike. Hedefa ku hatibû kirin, BDP'ê rehet kir. Niha em mêze dikin ku beşeke mezin a civaka Tirkiyeyê dixwaze ku çareserî pêk bê. Ji ber vê yekê jî AKP êdî rehetir e. Dikare hemû aktoran bike hesab û pêvajoya muzakera-diyalogê bide dest pêkirin."

**Ayhan Bîlgen:** Piştî referandûmê 4 partiyan daxuyanî dan û peymanên wekî boykot ji bo wan xetere ye dabûn. Ev yek vê nîşan dide ku di rojê pêş de dê li hemberî BDP'ê eniyekê ava bikin. Serokwezîr banga îttîfakê dike. Di daxuyaniyan de bi taybetî li ser biyara gel tê sekinandin. Lê wekî ku kurd ne gel e, rêzê li ber biryara wan nîşan nade. Kesên ku dibêjin ev gel bi salan in hatiye xapandin niha ew jî heman tiştî dikin. Ev yek jî derdixe holê ku baweriya jiyanê ya bi hev re negihîştiye. Ji îro şûnde mijara herî girîg eve ku dê xebateke nû ya makeqanûnê dest pê bike an na. Di pêvajoya referandûmê de her beşî daxwazên xwe anîn ziman. Lê em niha li bende ku xebateke makeqanûnê dê dest pê bike an na? Mafê zimanê dayikê dê di vê makeqanûnê de hebe an na. MGK, YOK dê di vê makeqanûna de li ku cih bigire. Divê îradeyeke siyasî ya bi hêz bersiv bide van pirsan. Boykotê li herêmeke Tirkiyeyê hebûna îradeyekê derxist holê. Helwesta boykotê serhildana li hemberî newekeheviyê ye.

**Ferhat Tunç:** Hunermend Ferhat Tunç, destnîşan kir ku têkoşîna azadiyê ya gelê kurd bi salan e dide, bi biryara boykotê ya derketiye holê ve dê pêşketinek mezin derbixe holê û wiha axivî: "Gelê kurd daxwazên xwe yên azadiyê li ser hemû tiştan girtiye û nîşan daye ku êdî tu tişt wekî berê nabe. Ev bersivek dîrokî a dikare encamên tenekirin û tunehesibandina bi sedan salan e didome bidawî bike." Tunç wiha dirêj kir: "Lazim e bi hirment nêzîkî vîna boykotê bibin. Lazim e biryara bêçalakîtiyê ya PKK'ê ya heta 20'ê îlonê hatiye dirêjkirin bê mayîndekirin. Bendewariyen me ev in. Êdî ev gel nayê xapandin. Kurdan derxistine holê ku dixwazin bi gelê tirk re jiyanek wekhev û birûmet bidomîne û rêya vê yekê jî wekî xweseriya demokratîk nîşan daye."

**Hakan Tahmaz:** Rojnameger Hakan Tahmaz, diyar kir ku encamên referandûmê 2 astan de ye, yek AKP li rojavayê di xîza nîjadperst, muhafazakar de bi hêz bû ketiye ya 2'yemîn jî helwesta boykotê zêde derektin bû. Tahmaz, anî ziman li hemberî boykotê AKP li herêmê ev dû caran têkçû û wiha got: "Divê êdî vîna kurdan muhatab bê girtin. Heke vê muhatabiyê li ber çav negirin, daxwaz xweseriya demokratîk li ber çav negirin derkevin riyê dê rageşî zêde bibe. Ez difikirim ku Erdogan dê ya xwe bike. Encama boykotê ya li herêmê dê bingeha siyastê bi lez bixe."

**Haluk Gerger:** Doç Dr Haluk Gerger, diyar kir ku di referandûmê de derdorên nîjadperest winda kirin û li gel vê yekê kurdan vîna xwe bi "boykotê" nîşanda û makeqanûna ew di nav de neyî qebûlnakin û wiha got: "Divê helwesta kurdan baş bê nirxandin. Piştî vê yekê divê êdî helwesta kurdan bê dîtin. Encama referandûmê pêdîviya makeqanûnekî din derxist holê. Divê hikûmet dest bi xebata makeqanûnekî nû bike."

**Ece Temelkuran:** Rojnameger Ece Temelkuran, diyar kir ku AKP û BDP'ê ev referandûme qezenc kir û piştî referandûmê heta hilbijartinên giştî dê tansiyona siyasetê bilind bidome. Temelkuran, anî ziman ku li herêmê boykotê encama xwe bi dest xist û wiha got: "Boykotê li herêmê encama xwe bi dest xist. Lê dema ku encama referandûmê aşkera dibûn li ser nexweşê boykot bi rengekî din nişan nedidan bêdengî çiqas rast e difikîrîm. Ji ber ku cihên bêden hemû rengê erê bû. Li aliyê din êdî pirsgirêka xweseriyê ya li herêmê dê di rojevekî girîng be."

**Divê li ber çavan bên girtin**

Rojnameger Ertugrul Kurkçu jî diyar kir ku bi boykotê gel vîna xwe nîşan da û wiha got: "Em dibînin ku pergalekî li jor ber bi jê ve na ji jêr ber bi jor ve pêktê. Lê helwesta boykotê ya fikar jî heye. Divê ev yek baş bê nirxandin. Bi helwesat boykotê di be ku bi xwe re pirsgirêkan jî bîne. Divê ev yek baş bê çareserkirin."

www.arsivakurdi.org

# Komkaran pereyê alîkariya ji bo Pakistanê xwarin

## Partiya PSK'ê ya bi serokatiya Kemal Burkay û rêxistina girêdayî wê pereyên ku ji bo alîkariyên mirovahî berhev dikin di nava rêveberên vê partiyê de tê belavkirin

**BERLÎN** - Pakistanê ku di dîrokê de rastî felaketa herî mezin a lehiyê hatibû, wekî gelek rêxistinan rêxistina Berlîn-Komkar dest bi kampanyaya alîkariya gelê Pakistanê kiribû lê tê îdiakirin ku vê rêxistinê ew pereyên ku bi vê armancê dane hev xwarine.

Rêxistina Berlîn-Komkar berê demekê kampanyaya "Ji bo Pakistanê alîkariya lezgîn" dabû destpêkirin. Ji bo pakistaniyên ku mexdûrî felaketê bûne derdora 20 hezar ewro alîkarî dane hev.

Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) û hin rêxistinên sivîl ên alman jî destek dane vê kampanyayê û alîkariya pereyan kirine.

Li gorî agahiyên hin derdorên nêzî vê rêxistine tê îdiakirin ku ew pere şandine Pakistanê û gihaye destê wan û li navenda PSK'ê jî tê gotin ku ew pere di nava rêveberiya PSK'ê de hatine parvekirin.

Berî çend salan jî Orkestra Berlîn Senfonî jî hatinên xwe yên konserekê dabûn rêxistina Berlîn-Komkar û ew pere jî dîsa di nava rêveberiya wê de hatibûn parvekirin û ev yek ji alî raya giştî ve hatibû zanîn.



## YE: Em ê bişopînin

**BRUKSEL / ANF** - Yekitiya Ewropayê (YE) encama referendûmê gaveke erênî dît. Ancax diyar kir ku ew dê pratîzekirinê ji nêz ve bişopînin.

Endamê Komîsyona Berfirebûnê ya Ewropayê Stefan Fule der barê mijarê de daxuyaniyeke nivîskî da. Di daxuyaniyê de diyar kir ku encama referandûmê daxwaze gelê li Tirkiyeyê dijin li ber çavan raxistiye û xwest hikûmet vê li ber çavan bigire û pêvajoya reforman bide destpêkirin. Fule destnîşan kir ku pêkhatine reforman rast e. Ji ber vê jî YE'yê di hevdîtinên bi Tirkiyeyê re demeke dirêj e ji Tirkiyeyê dixwaze ku di dadgeha bingehîn de li gorî krîterên YE'ê guherîn pêk bên û pratîze bibin. Hat gotin ku hin guherîn pêk hatin, gel vê qebûl kir û daxwaza YE'yê jî ev e ku li gor daxwaze gel biryar bên pratîzekirin. Stefan Fule bang kir ku heke guherîna qanûna bingehîn dest pê bike divê li gorî ruhê diyalog û lihevkirinê nîqaşeke berfireh bê kirin û wisa bê guhertin.

# Li Iraqê îşkence û tundî berdewam e

**NEW YORK** - Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî diyar kir ku bi hezaran kes li Iraqê bê ku bên darizandin di girtîgehan de tên girtin û îşkence li wan tê kirin.

Di rapora rêxistinê de tê diyarkirin ku bi kemanî 30 hezar iraqî bê ku bên darizandin di girtîgehan de tên girtin û îşkence li wan tê kirin.

Li gorî raporê ev kes mercê ku serlêdan bikin nabînîn, ji vana hin kes di binçavan de bi îşkenceyê û ji ber şert û mercên ne baş hatine kuştin.

Rêxistina Efûyê bi rapora amade kirî bal dikişîne ser binpêkirina mafê van girtiyan û wiha pêde diçe: "Hêzên 'ewlehiyê' yên Iraqê bi awayeke bê navber mafê kesên ku di bin çavan de û di girtîgehan de digire binpê dike."

Rêxistin ji bo rêbazên îşkenceyê jî tespîtên balkêş rêz dike. Di de zanîn ku di nav êşkenceyên ku tên kirin de işkenceya wek bi qabloyê dirêj û luleyan lêdan, şikandina mil û çaqên mirovan, bi aletên ku di laş de vekirina kunan û tecawizê bikar tînin.

Her wiha gefa tecawizê jî wek îşkenceya pîskolojîk li ser serê girtiyan de wek zext û fişara mezin tê bikaranîn.

Li Iraqê kontrola girtîgehan di tîrmehê de hêzên Iraqê wergirtin. Ancax li Iraqê hê jî hin girtîgeh hene ku kontrola wan di kontrola leşkerên Amerîkayê de ne. Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî beşek ji bo Başûrê Kurdistanê ji Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê re jî veqetandiye. Ji bo pêkanînên girtîgehên başûrê Kurdistanê rexne nake.

Dide zanîn ku li vir li dijî girtiyan muameleyê tê kirin di asta însanî de ye. Ancax Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê jî ji ber pêkanînên girtîgehên Iraqê bi giştî berpirs dibîne û di vê astê de hikûmeta navborî jî rexne dike. Ligel van rexneyan ji bo têkûzkirina girtîgehan tu gavên erênî nehatine avêtin.



# Di salvegera darbeya Şîliyê de şer derket

**SANTÎAGO** - Di salvegera 37'emîn a darbeya dîktatorê Şîliyê General Augusto Pînochet de şer qewimî û di vê şerî de 9 jê polîs 13 kes birîndar bûn û 251 kes hatin binçavkirin. Pînochet di sala 1973'yan de bi darbeyeke leşkerî desthilatdariyê desteser kiribû.

Protestoya herî mezin li paytexta Şîlî Santîagoyê pêk hat. Xwepêşandêran lig elek deverên bajêr lastîkan şewitandin û barîkatan danîn û bi polîsan re şer kirin.

Ji ber ku zincirên hesin avêtin ser têlên ceriyanê gelek tax bê ceryan mane. Polîsên Şîliyê diyar kirin ku protestoyên îsal ji yên salên borî kêmtir in.

Ji bo bîranîna qurbanên darbeyê meşa ku li Santîagoyê pêk hat, bê ku bûyer biqewime bi dawî bû. Ancax di dawiya meşê de komek kesên ku riyê wan girtîbû êrîşê rojnamegeran kir. Polîs mudaxeleya vê komê kir û wan bela kir.

Pînochet bi piştgiriya Amerîkayê roja 11'ê îlona 1973'yan de Serokdewletê demê yê Şîliyê Salvador Allende ji desthilatdariyê daxist. Di dema dîktatoriya Pînochet de bi kêmanî 3 hezar kes hatin qetilkirin û li 25 hazar kesî îşkence hat kirin.




# Partiya Komunîst li dijî Sarkozy dest bi şer kir

**PARÎS / ANF** - Sekreterê Neteweyî yê Partiya Komunîst a Fransayê (PCF) Pîerre Laurent, li dijî Serokomarê Fransayê Nîcolas Sarkozy şer îlan kir û da zanîn çepgir li dijî reforma teqawidê bêdeng namînin.

Sekreterê Neteweyî yê PCF'ê di axaftina dawî ya girtinê ya cejna Humanîte (Însaniyetî) ku her sal wek çandekê li Fransayê tê pîrozkirin de bal kişand ser desthilatdariya Nîcolas Sarkozî

Û wiha got: "Ji sala 2007'an û şûn ve li Fransayê fransî bi desthilatdariya herî totalîter, herî xedar û otariter re rû bi rû ye."

Cejna Humanîteyê bi beşdariya 10 hezaran kesî bi konsera Jacques Dutronc bidawî bû.

Laurent di axaftina xwe ya berya konserê de got ku ev desthilatdarî li hemberî karsazan di nav şer deye û em, karsaz ligel hev li dijî vê desthilatdariyê şerekî hevbeş dimeşînin. Ev şer şere waletaniyan ya aştiyaneye. Laurent destnîşan dike ku pozîsyona deshilatdariya, Nîcolas Sarkozy û organîzasyonên patronên Medef li dijî gel û karkeran şer e. Her wiha li dijî Komarê û nirxen Komarê, li dijî romanan, xizanan, ciwanan, biyaniyan û fransiyan şer e. Laurent vegot ku pêwîstî pê heye li dijî Desthilatdariya Bazara Malî Şoreşa Civakî pek bê, li dijî desthilatdariya monarşîk ya Sarkozî jî pêwîstî pê heye şoreşa welatiyan û demokrasiyê pêk bê. Laurent jî der barê biryara wan a referandûma tewqawidê de dê paşve gav neavêjin û wiha pêde çû: "Rêzadar Sarkozy em dê te têk bibin." Laurent da zanîn ku her dem gotinên çepgiran bibiryar û ne tevlêhev in. Hikûmeta Fransayê ligel ku bi milyonan fransî daketin kolanan û referanduma teqawidê paşve bê kişandin jî hikûmetê vê daxwazê hê jî negirtiye qalê. Bi vê qaşo reformê salê teqawidê ji 60'an derdixe 62'yan. Ji bo ku ji teqawidê bi temamî sûdê wergire jî salê 65'an derdixe 67'heftan. Roja 7'ê îlonê sendîkayan li dijî vê biryarê 3 milyon welatî daxist kolanan û li dijî biryarê çalekî li dar xistin. Sendîka destê xwe xurt kirin. Bi vê hêzê bang li hikûmetê kirin û xwestin dev ji vê biryarê berde. Lewra Sendîkayên bi navê CGT, CFDT, CFTC, CFE/CGC, FSU û Unsa careke din bang kirin ku roja 23'yê îlonê grev li dar bixin.




www.arsivakurd.org

# Li Herêma Kurdistanê sala borî 382 jin çûn stargehan

**Wezîra Kar û barên Civakî ya Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê Asos Necîb Asos balkişand ser rewşa jinên Başûr û destnîşan kir ku li Herêma Kurdistanê sala borî 382 jin ji ber pêkutiyan li stargehan hatine bicihkirin**



**HEWLÊR** - Wezîra Kar û Karûbarên Civakî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Asos Necîb Asos ragihand ku sîstemek nû hatiye danîn bo birêvebirina karûbarên stargehan ku sala dahatû dikeve plana wezaretê: "Li gorî vê sîstemê, tevahiya stargehan dixin bin çavdêriya Wezareta Kar û Karûbarên Civakî."

Li gor îstatîstîkên Rêveberiya Şopandina Tundûtûjiya Dijî Jinan li Wezareta Navxwe, di şeş mehên pêşîyên îsal de 40 jin hawara xwe gihandine Sentera Newa li Hewlêrê ku cihê hewandina jinên li jêr gefê ye, di dû salên borî de jî 303 jin çûna heman senterê. Li Parêzgeha Silêmaniyê jî sala borî 149 jinan berê xwe dane stargeha taybet a Rêveberiya Şopandina Tundûtûjiya Dijî Jinan li Silêmaniyê, lê sala borî li Dihokê tenê 70 jinan berê xwe dan navendên taybet ên hewandina jinan.

Li Kurdistanê 7 stargeh û cihên hewandina jinan hene, ku dû ji van stargehan ser bi rêxistinane wek Sentera Asûde ku ser bi Rêxistina Asûde ye û Landika Aram ku ser bi Yekîtiya Jinên Kurdistanê ye û stargeh jî ser bi Wezareta Navxwe ye û 4 stargeh jî ser bi Wezareta Kar û Karûbarên Civakî ne.

Endamê Sekretariyeta Yekitiya Jinên Kurdistanê û serperiştiyarê Landika Aram li Silêmaniyê Seywan Rostem got: "Li gor me baş e, ev stargeh bi awayekî hevbeş ji aliyê rêxistin û hikûmetê ve bên serperiştîkirin û pirsgirêkên wan bên şopandin, ji ber armanca rêxistinên jinan şopandina pirsgirêkên jinane."

Bi baweriya Seywan, stargehên Kurdistanê kêm in û divê stargehên din bên vekirin nemaze li bajarên mezin bi mercê ku kesên pispor li wan bên danîn ku bikarin bi tevahî li aliyê mirovatiya wan bikolin, ji ber pirsgirêkên jinan zêde ne.

Rêveberiya Şopandina Tundûtûjiya Dijî Jinan û saziyên civaka sivîl û Wezareta Kar û Karûbarên Civakî çend workshopek çê kirin bo danîna sîstemeke nû bo jiyana jinên vehewandî û karê stargehan.

Rêvebera Giştî ya Rêveberiya Şopandina Tundûtûjiya Dijî Jinan li Wezareta Navxwe Kurde Umer bo Rûdawê got: "Bi awayekî berdewam civîn tên kirin bo danîna bernameyeke guncaw bo stargehan, di vê demê de ligel serokê hikûmetê, wezîrê dad û rewşenbîrî û karûbarên civakî û berpirsên stargehên sivîl civiyane. Wezareta Kar û Karûbarên Civakî reşnivîseke taybet di vî warî de amade kiriye bo baştirkirina jiyana jinên li stargehan."

Kurde Umer wiha axifî: "Me bernameyek der barê stargehan de amade kiriye, ne pêwîst e stargehên berdewam ên Wezareta Navxwe hebin, divê hemû ser bi Wezareta Kar û Karûbarên Civakî bin, me pêşniyar kiriye çend stargehên demkî li navçeyên ku tundûtûjiya dijî jinan li wan zêde ye bên vekirin."

Kurde wiha dirêjî bi axaftina xwe da: "Ger li stargehekê karekî ne rewa derheqê jinên li stargehê bê kirin, divê dadgeh mafên wan li wan vegerîne."




10'ê tebaxa îsal Wezareta Kar û Karûbarên Civakî workshopeke taybet derbarê gotûbêjkirina reşnivîsa sîstema senterên hewandina jinan kir bo rêvebirina stargehan. Wezîra Kar û Karûbarên Civakî Asos Necîb bo Rûdawê daxwiyand: "Me sîstem û bernameke baş daniye bo birêvebirina senteran di çarçoveya yasayekî de jiber hê sîstemeke yekgirtî nîne bo rêxistina jiyana jinên li stargehan, her wiha me lîjneya bilind pêk aniye derbarê birêvebirina stargehan. Pir girîng e em bikarin stargehan bi awayekî biguncînin û jiyana jinên hewandî biparêzin û wan fêrî kar bikin û wan li civakê vegerînin." Wezareta Kar û Karûbarên Civakî prototîpek amade kiriye bo dirustkirina sê stargehên mezin li Silêmanî, Hewlêr û Dihok û ligel serokê hikûmetê civiyaye û wî jî biryar daye bixe plana hikûmetê ya sala dahatû. Wezîra Kar û Karûbarên Civakî Asos Necîb got: "Ger ev hersê stargeh bên dirustkirin, cihê jinan li gor pirsgirêka wê tê cudakirin û li jêr çavdêriya me dimînin."

Asos wiha dirêjî bi axaftina xwe da: "Stargehên ku ser bi saziyên civaka li jêr çavdêriya Wezareta Kar û Karûbarên Civakî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê kar dikin û hevahengî di navbera wan û rêveberiyên tundûtûjiya dijî jinan de heye. Lê karê me ne tenê vekirina stargehên nû ne, lê hişyarkirina jinan e. Me grûbeke gerok dirust kiriye ku wê di dahatû de serdana wan cihan bike ku stargeh li wan nîn in. Ev grûb wê jinan hişyar bike û mafên wan bi wan bide naskirin û pirsgirêkên wan çareser bike."

Ji alîkî din ve, biryardera Lîjneya Yasayî ya Parlamenê Kurdistanê Rojan Evdilqadir ragehand: "Lîjneya me proje qanûn nehiştina tundûtûjiya malbatî sererast dike. Em ligel hemû aliyan civiyan da kêmasiyên qanûn behskirî ji holê rakin û projeyeke gihiştî bigihînin destê parlamen." *(Rûdaw)*

## Çima tirsa ji kurdan?

Di sala 1920'î de di Konferansa Kahîre'yê de der barê kurdan de biryarên ji bo tunekirina kurdan de hatin wergirtin da ku kurd mafên xwe yên civakî tu carî bidest nexin û pirsgirêka kurd bibe wekî kangrenê. Ev yek di bin pêşengiya Fransa û Îngilistan de hate pêk anîn. Lewra tê dîtin ku ev pirsgirêk ji sala 1920'î heta roja îro didome. Ji ber vê sedemê piştî wê bi demek kurt Kurdistan di nava sînorên dewletê Rojhilata Navîn de hate parçekirin û bi vî awayî hemû cureyên înkar û tunekirinê li ser gelê kurd dane meşandin. Kurd li gorî berjewendiyên pergalên desthilatdar hatin bikar anîn û bûn mijara bazarê. Ji ber polîtîkayên dabeşbike, parçebike û rêvebibe, kurd nebûn xwedî îrade û ji çand û nasnameya xwe biyanî bû. Li hember pergala desthilatdar û van polîtîkayana her çiqas serhildanên kurdan bipêşketibin jî ev bi ser neketin. Her wiha li hember kurdan polîtîkaya 'seg bi seg dayîna kuştin' ango li ser mijarên herî basît û jirêzê polîtîkaya brakujiyê xistin dewrê da ku kurd hevdu bikujin û yekîtiya xwe ava nekin. Di encama vê polîtîkayê de dîsa yê qezenc dike, dewletên dagirker bû. Sedemên vê yên herî girîng jî gelê kurd ji bîr û baweriya kurdewarî û xetek îdeolojîk û polîtîk a rast dûr mabû, ji zanîna dîrokê û ji gihîştina kesayetek serkeftî biyanî mabû. Desthilatdar wiha dihizirîn ku weke di dawiya çewsandina îsyana Agirî de di rojnameya 'Mîlliyet' a tirkan de hatibû weşandin, Kurdistan xistibûn nava gorê û beton kiribûn û bi vî awayî pirsgirêka kurd heta hetayê ji holê rakiribûn.

Ji ber van sedeman gelê kurd ku li Rojhilata Navîn hejmara wan digihêje çil milyonî, heta roja îro nebûye xwedî dewlet û nebûye serdest. Li gel vê taybetmendiya gelê kurd a balkêş, tişta ku herî zêde gel an jî netewek pê tê nasîn û bingehê hebûna wî ye, çand û ziman e, lê çand û zimanê kurdan jî hatiye qedexe kirin.

Kiryarên ku li Kurdistanê pêk hatiye, heta derketina tevgera azadiya kurd a di bin rêbertiya Rêber APO de didome. Bi asta têkoşîna ku îro kurd gihîştinê ev polîtîkayana hatin pûç kirin û îro gelê kurd di riya kurdekî azad û bivîn de bi gavên xurt, qewîm û rêkûpêk davêje. Tevgera ku bi du peyvan û ji komek 5 kesan dest bi xebatê kir, piştî pêngavên mezin ên weke damezrandina PKK'ê, pêngava 15'ê Tebaxê ango şoreşa vejînê, îro bûye malê bi milyonan kurd û gihîştiye asta modela xweseriya demokratîk pêk bîne.Bi tekoşîna ku Rêber APO û PKK'ê daye meşandin ve gelê kurd ji nû ve vejiya û xwedî li çand, ziman û nasnameya xwe derket û gelê kurd ê bi zihniyetek nû hatiye rêxistin kirin, di nava gelên cîhanê de cihê xwe yê rumetdar girt.

Di 26'emîn salvegera 15'ê Tebaxê de gelê kurd xweseriya demokratîk îlan kir û gelê kurd bi vê dide nîşan ku êdî ew hatiye asta xwe bi rêve bibe. Bi taybet piştî pêngava 1'ê Hezîranê coşa gelê kurd a xweseriya demokratîk daket kolanan û gelê kurd nîşan da ku ew di serdema çaremîn de ji bo çareseriya pirsgirêka kurd li hêviya dewletê namîne, wê hebûna xwe biparêze û ji bo bidestxistina azadiya xwe têkoşîna xwe ya bêhempa bidomîne. Xweseriya demokratîk jî dibe modela çareseriyê ya kurdan. Gelê kurd ev model pejirandiye, lewra li kolanan xweseriya demokratîk silav dike û herêmên xweser îlan dike. Ji bo xwedî derketin û pêkanîna xeseriya demokratîk divê gelê kurd rêxistinbûna xwe xurtir bike. Her wiha divê gelê kurd helwesta xwe li hember dûrutî û polîtîkayên xapînok ên AKP'ê aşkera nîşan bide û bi taybet referandûma di 12'ê Îlonê de pêk were boykot bike.

Ji êniya Tirkiye nîqaşên der barê xweseriya demokratîk de jî ji fobiya ango ji tirsa 'wê dewlet parçe bibe, dê kurd cuda bibin' çavkaniyê xwe digre. Di sedeya em ketinê de êdî zihniyeta yek ziman, yek al, yek dewlet, yek netewe hatiye derbas kirin.

Li cîhanê êdî serdema hemû çand, ziman, nasname, bawerî û hwd. dikarin bihevre bijîn destpê dike. Divê tu kes ji pirrengîniyê netirse, lewra pirrengînî dewlemendî ye.

*Dicle XABÛR*


## Li Îlamê di rojekê de 3 keç hewl dan xwe bikujin

**ÎLAM** -Li Îlama rojhilatê Kurdistanê di rojekê de 3 keçan hewl dan xwe bikujin. Hat ragihandin ku yek ji wan jiyana xwe ji dest da û jiyana 2 yên din di metirsiyê de ye.

Li gorî agahiyan li Îlamê, di rojekê de 3 keçan di vî parêzgehê de hewl dan xwe bikujin. yek ji wan jiyana xwe ji dest daye û rewşa yên din pir xirab e û niha di nexweşxaneyê de têne dermankirin. Ew keça 17 salî ku ji ber şewatê jiyana xwe ji dest daye xelkê bajaroka Aywana rojava yê Îlamê bû, her du keçên din xelkê Îlam û Dire Şehr in û temenê wan di navbera17 û 18 de ne.

## Hejmara jinên xwende kêmtir e

**STENBOL**- Li gorî daneyên TUÎK'ê li Tirkiyeyê ji sedî 10 kes xwendin û nivîsandina wan tune ye. Her wiha ev jî ji sedî 84 ji jinan pêk tê. Li Tirkiyeyê her çiqas pergala perwerdehiyê hejmara mirovan a xwendin û nivîsandinê zêde bike jî, di navbera jin û mêr de dîsa cudahiyeke mezin derdikeve holê.



Saziya Îstatîstikê ya Tirkiyeyê (TUÎK) li gorî anketa hêzakar a nava malbatî daxuyaniyek da û diyar kir ku li Tirkiyeyê ji nifusa li ser temenê 15'î 5 milyon û 647 hezar kes xwendin û nivîsandina wan tune ye. Her wiha 4 mîlyon û 742 hezar jî ji jinan pêk tê. 932 hezar jî ji mêran pêk tê. Yanî ji sedî 84 jin in.

Nezanîna xwendin û nivîsandinê jî astengiya herî mezin a li hemberî tevlibûna jiyana aborî û civakiye. Lêkolîngerên Navenda Lêkolînê ya Civakî û Aborî ya Zanîngha Bahçeşehîrê Doç Dr Gokçe Uysal Kolaşîn û Duygu Guner raporeke amade kirin û xwestin ku kesên ku xwendin û nivîsandina wan tuneye ji bo wan bila serferberiya xwendin û nivîsandinê bê dest pê kirin.

### Newekhevî didome

Di rapora ku ji aliyê Kolaşîn û Gunerî de hatiye amade kirin de, astengiyên li hemberî jinê balê dikişînin; Dema ku mirov jin û mêran tînin hemberî hev rêjeya xwendin û nivîsandinê ya mêran zêdetir e. Her wiha pergala xwendin û nivîsandinê li Tirkiyeyê pêş ketibe jî cudahiya di navbera jin û mêran de naguherîne. Nezanîna xwendin û nivîsandinê astengiya herî mezin a li pêşiya mirovan e. Ev yek jî di her qadê de zextê li ser jinê zêdetir dike.

## Cemîleya 15 salî ji ber evîndariyê hate kuştin

**EFRÎN** -Hat ragihandin ku li Efrîna başûrê rojavayê Kurdistanê, bavê 39 salî keça xwe ya 15 salî kuştiye.

Li gorî malpera Aksalser bavekî 39 salî keça xwe "Cemîle" ya 15 salî biribû nêzî gundê Qîbarê (Aşqîbar) ya bi ser bajarê Efrînê û li wir bi çeka xwe ew kuştibû.

Li gorî çavkaniyên Aksalser bavê ku keça xwe kuştiye, bi hinceta ku keça wî têkiliyeke evînî dijî ew kuştiye. Bijîşk otopsî li bedena keçikê kir û diyar kir ku di perdeya keçaniyê de parçebûnek kevn hebû.

www.arsivakurdi.org

Rojekê li Geliyê Zîlan

# Çemê Zîlanê bi cenazeyan tijî bû

Di rojnameya Cumhuriyetê ya 16'ê tîrmeha 1930'an de ji bo Qirkirina Zîlanê wiha digot: "Di hereketa Zîlanê de zêdetirî 15 hezar eşqiya hatin îmhakirin. Şerê li wir bi tarzekî serkeftî pêk hatiye û çemê Zîlanê bi cenazeyan tijî bûye"

NURÎ FIRAT – SIDDIK GULER

Qirkirina Zîlanê ku piştî bi salan em çûn di cih de me dît û kîtekîteyên wê nivîsand di çarçoveya Serhildana Agiriyê de ye. Hovîtiya herî mezin dibe ku li çemê Zîlanê hatibe jiyîn. Ji ber vê ji bo fêmkirina Qirkirina Zîlanê divê Serhildana Agiriyê û bûyerên li herêma çemê Zîlanê qewimîne mirov binirxîne. Bandora Serhildana Agiriyê di sala 1930'an de li nava eşîrên Hemoyan, Îskan, Bekiran û Hecî Deriyan ên l içemê Zîlanê dengvedabû. Her wiha li herêmê kurên Kor Huseyîn Paşa ku endamê Alayên Hamîdiye bûn jî tevli serhildanê bûn.

Di çarçoveya serhildanê de di 20'ê hezîrana 1930'an de qereqola li gundê Hasan Abdal ji aliyê hêzên kurd ve hatibû serdegirtin, piştre êrîşî qereqola Noşar û Çakirbeg kiribûn. Di van êrîşan de ku çend sed leşkerên tirk hebûn nîvî hatin kuştin û nîvî jî êsîr hatin girtin û dest danîn ser çekên wan.

Serdegirtina qereqolên li çemê Zîlanê bi emrê Îhsan Nûrî Paşa pêk hatibû. Îhsan Nûrî Paşa fêm kiribû ku dewleta tirk ji bo Serhildana Agiriyê biçewisîne bandorê li ser eşîrên li herêma Zîlanê bike û li hemberî wan bi kar bîne. Her wiha Îhsan Nûrî Paşa dixwest ku şerê li çiyayê Agiriyê hatiye bi sînor kirin belavî çeperên din jî bibe. Bi vê yekê çembera dewleta tirk bişkanda. Ji ber vê yekê xwest hemleya destpêkê ew bike û wiha kir. Li Zîlanê pevçûnên destpêkê wiha dest pê kirin. Lê Îhsan Nûrî Paşa qeyd kiriye ku êrîşên li çemê Zîlanê beriya dîroka destnîşan kiribûn dest pê kiriye. Vê yekê bi şaşfêmkirina talîmata şandiye ve girêdide. Di encamê de li çemê Zîlanê bi serdegirtina qereqola li gundê Hasan Abdal dest pê kiribû di demeke kurt de belavî Erdîşê bû û li gelek cihan qereqolên dewletê hatin desteserkirin û heta du balafirên şer jî hatibûn îmhakirin. Hêzên kurd ên çekdar çend kes bûn, ji ber vê serweriya wan a li çemê Zîlanê ji bo demeke kurt bû. Piştre bi taqwiyekirina hêzên leşkerî yên derdorê dewleta tirk serhildana li çemê Zîlanê bi awayekî hovane çewisand.

Çemê Zîlanê bi rojan bi mîtralyozan hate gulebarandin, balafiran bombebaran kir, gund hatin şewitandin. Çewisandina tevgera li qontaxên Agiriyê çavtirsandineke mezin bû û encamên erjeng bi xwe re derxist. Di rojnameya Cumhuriyetê ya 16'ê tîrmeha 1930'an de wiha tê gotin: "Li qontaxên Agiriyê gundên ku tevli eşqiyaya bûn bi tevahî hatin şewitandin û niştecihên wê li Erdîşê hatin bicihkirin. Di hereketa Zîlanê de zêdetirî 15 hezar eşqiya hatin îmhakirin. Tenê ji aliyê mufrezeyekê tê texmînkirin ku hezar kes in. Di çemê Zîlanê de 5 eşqiya jî teslîm bûye. Şerê li wir bi tarzekî serkeftî pêk hatiye û çemê Zîlanê bi cenazeyan tijî bûye."

Qirkirina Zîlanê heta 3'yê îlona 1930'ê berdewam kiribû. Di qirkirinê de îmze avêtin binê hovîtiyên erjeng. Tiştê ku rojnameya Cumhuriyetê nivîsandine û kesên ku bûne şahidên qirkirinê em bi van re li Erdîşê axivîn tiştê hatine jiyîn bi awayekî aşkera radixîne ber çavan.


Di gera me ya çemê Zîlanê de hê jî mirov di nava keviran de rastî hestiyên zîlaniyan tê.

**Paranoya beralîkirna kurdan?**

Bi serhildana Agirî û di çarçoveya Qirkirina Zîlanê de em dixwazin behsa nêzîkatiya dewleta tirk a ji bo kurdan jî bikin.

Rêzenivîsek Yusuf Mazhar Beg di 18-22'yê tîrmeha 1930'an de di rojnameya Cumhuriyetê de der barê Serhildana Agiriyê de hate weşandin. Di cihekî de wiha dibêje: "Li wê derê ruhê serhildanê, weke sîtila li ocaxa agirperest her daîm bikele. Wisa xuya dike, vê carê çend henasên bi jehr, agir zêdetir geş kirine, tiliya çend xayinan ev zêdetir fûrandine û sîtila ebedî fûriyaye… Îro li vir kurd karên ku her tim dikin dubare dikin. Û her tim tiştên dîtine belkî vê carê tiştên nedîtine bibîbinin." Yusuf Mazhar Beg piştî van gotinên xwe heqaretê li kurdan dike. Kurdan dişibîne kêzikan û weke kêzikan dê bipelçiqînin. Tiştê ku ji bo kurdan rewa dibîne wiha tîne ziman. Ev nêrîn nîşan dide ku kurdan çawa biçûk dibînin. Ji ber vê ji aliyê dîrokzanên fermî Serhildana Agiriyê weke bûyereke diziyekê hêsan nîşan dide û dîrokzanên tirk di vê çarçoveyê de vê yekê tînin ziman. Li gorî vê nêrînê kurd daxwazên polîtîk nikarin bikin. Ew ancax dizekên hêsan û tiştê bikin jî dizî be. Ji ber vê jî dê weke kezikan bipelçiqin.

Di heman demê de ji ber ku kurdan nisîbê xwe ji şaristaniyê negirtine her tim serî hildidin û eşqiyatiyê dikin. Ne xwediyê tevgerên mirovên medenî ne.

Nirxandina serhildanên kurdan li gorî nêrîna fermî wiha ye.

**Dubarekirinên 'hêzên derve'**

Nêrîneke din jî serhildanên kurdan bi hêzên derve rave dikin. Tiştên ku qet nayê hişê mirov tînin ziman.

Ji ber vê mirov li çend mînakên Serhildana Agiriyê binêrê baş e. Di rojnameya Cumhuriyetê de di 10'ê tîrmeha 1930'ê de der barê nirxandina Serhildana Agiriyê ku 'girêdayîna wê ya derve' wiha vedibêje: "Ji aliyê din ve teqez e Çerkes Ethem li sînorê Iraqê digere. Li Iraqê ji şîmalê heta Mûsilê nifûseke kurd heye. Sîxurê îngilîz Lawrance par li sînorê Îran û Iraqê hatibû dîtin. Bûyerên niha îspat dike ku ev mirovê şeytan bi rastî li wan cihan digere.

Lawrance belasebeb nagere, sîxurekî ku Hîcaz û Afganistan têk biriye yên wî nas dikin dizanin ku amadekariya hereketekê dike…"

Ayşe Hur jî di rojnameya Tarafê de di 24'ê gulana 2009'an de der barê rêxistina Xoybûnê de ku nêrîna fermî ya tirk dihewîne wiha dibêje: "Heman salê, kevnendamên Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê, Şêx Seîd, Bedîrxan Beg û zarokên Cemîl Paşa û hin serokên eşîrên ku neyartiya hev dikin û li gorî îdiaya îstixbarata tirk hin endamên Komîteya Taşnak a Ermenî, li Lubnanê Hoybun (Xoybûn di kurdî de 'serbixwe' ye. Lê dîrokzanên fermî navê rêxistinê di ermenkî de Haybun 'warê ermeniyan' tê îdia dikin) ava kiriye. Bi vî rengî kesên ji çolterê û bajarî an jî faîl û mexdûrên hatine beranberî hev zewaca zorakî ya kurd û ermeniyan derketiye holê. Armanca rexistinê ya baskê kurd li gorî peymana Sewrê dewleteke kurd a serbixwe ava bike."

Dema mirov li van her du mînakan dinêre kurd ji aliyê 'hêzên derve' hatine beralîkirin, îradeya kurdan tuneye û ji aliyê 'hêzên derve' têne bikaranîn.

Çerkes Ethem, di 1920'an de dewleta tirk ew xapand, ji ber mafên çerkesan neda serî hilda, serhildan bi xwînê hate çewisandin, mecbûrî çû Yemenê û li wê derê wefat kir. Ji ber vê di dema serhildana Agiriyê de dîtina wî ya li sînorê Îran û Iraqê xeyal e. Tu delîlên ku sîxurê îngilîz Lawrance ku di salên 1900'î de di têkoşîna ereban a li hemberî osmaniyan de rolekî mezin lîst li sînor hatiye dîtin tune ye. Weke qenaetekê tê gotin.

Lê dema mijar kurd bin hewcedarî bi delîlan tune ye, qenaetek jî bes e. Ji ber ku li gorî wan kurd nikarin têkoşîna azadiyê bimeşînin. Hêzên derve ew bi rê ve dibin. Ev hêzên derve jî carna Çerkes Ethem, carna Lawranceyê îngilîz, carna jî ermenî ne. Ev yek nîşan dide ku kurdan çawa biçûk dibînin.

Der barê ermeniyan de jî heman armancan dihewîne. Îhsan Nûrî Paşa di pirtûka 'Serhildana Çiyayê Agirî" de tenê behsa têkiliyeke şênber a ermeniyan dike. Ew ermeniyê bi navê Ardeşîr Muradyan e ku hevalê Îhsan Nûrî ye. Muradyan piştre ji aliyê rûsan ve bi kompleyê êsîr tê girtin û sirgunî Sîbîryayê dikin û careke din agahî jê nayê girtin. Dema Muradyan li Agiriyê diçe serdana Îhsan Nûrî propoganda dest pê dike û Îhsan Nûrî wiha bersiv dide: "Hin derdor ji vê ziyareta ya fermandarê kurd wiha dibêjin 'Ji bo ermenî piştgiriya kurdan bikin li Agiriyê ne' Lê ev ne rast e."

Tiştê ku Îhsan Nûrî digot 'ne rast e' ji bo serhildanên kurd ên din jî hate bikaranîn. Serhildana Şêx Seîd her tim bi zêrandina îngilîzan ve hate ravekirin. Herî dawî ji bo têkoşîna PKK'ê jî heman îdia hatin pêşkêşkirin. Destpêkê gotin ji aliyê rêxistina ermenî Asala ve hatiye avakirin. Piştî ku ev yek nebû vê carê gotin PKK ji aliyê MÎT'ê ve hatiye avakirin. Piştî ku ev yek jî nebû vê carê têkiliya wê ya bi Ergenekonê re hate pêşkêşkirin. Sedemên ku têkoşîna azadiya kurd weke diz, eşqiya binavkirin û girêdayîna bi hêzên derve yên îngilîzan re xizmeta vê yekê dikin: 1- Kurd weke gel nayê qebûlkirin û ji ber vê biçûk têne dîtin. 2- Bi vê yekê re têkoşîna azadiya kurd berovajî dikin rastiya wê ji civakê vedişêrin û kurd weke civateke wisa biçûk dibînin ku nikare têkoşîna azadiyê bide.

Lê di rastiya xwe de ev propogandayên reş ji aliyê gelê kurd ve tu carî nehatiye qebûlkirin.

**Li şûna encamê:**

Piştî Serhildana Agiriyê têk çû û li çemê Zîlanê qirkirinek pêk hat serokwezîrê wê demê Îsmet Înonu wiha digot: "Li vî welatî tenê neteweya tirk xwedî daxwazên ku mafên irqî û etnîkî bike ye. Ji bilî wê mafê tu kesên din tuneye." (Rojnameya Milliyetê, 31 tebax 1930)

Piştî Înonu, Wezîrê Dadê Mahmut Esat Bozkurt jî li Odemîşa Îzmîrê wiha digot: "Tirk tekane efendiyê vî welatî ye, xwediyê tekane ye. Kesên ne tirkên xwerû bin tenê mafekî wan heye; mafê xizmetkirinê, mafê koletiyê. Dost û dijmin, heta çiya jî vê heqîqetê wiha bizanibe!" (Rojnameya Milliyetê, 19 îlon 1930)

Ev gotinên nijadperest ji bo fêmkirina zihniyeta qirkirina li hemberî kurdan bes e. Ev gotin piştî Serhildana Agiriyê û Qirkirina Zîlanê hatibûn gotin.

Mistefa Kemal jî dema Serhildana Agiriyê dest pê kiribû wiha gotibû: "Ew hêman dersa xwe standiye û careke din şûrê xwe li hemberî min raneke."

Dema Mistefa Kemal ev gotin digotin li Agiriyê serhildan dest pê kiribû. Bersiva axivîna Înonu û Bozkurt bi rehetiya ku li Agiriyê serhildan bi qirkirinê çewisandine piştî çend salan ji Dêrsimê hatibû.

***

Dosyaya me ya bi çavdêriyên ku li çemê Zîlanê bi hezaran mirovên sivîl hatin qetilkirin dest pê kir û piştperdeya Serhildana Agiriyê ya dîrokî vegot encamên girîng derxist holê.

Ev yek teqez e ku di Serhildana Agiriyê de sûcê mirovahiyê pêk hatiye. Daneyên têkildarî Qirkirina Zîlanê ji bo vê yekê bes e. Ev tiştên me behsa wê kirin ji ber xwe ve neqewimî. Di rastiya xwe de bi nasnameya kurd ve girêdayî ye. Bi komarê re înkara kurdan esas hate girtin. Li hemberî vê yekê kurdan gelek caran serî hildan. Ev serhildan her tim rastî înkarê û hereketên îmhayê hat û encamên wê jî trajîk bûn. 90 salên dawî tiştekî nîşanî me dide. Ew jî; lêgerîna kurdan a ji bo maf, edalet û azadiyê ligel hemû rêbazên înkar û îmhayê nayê çewisandin.

Tiştê îro bê kirin divê bi dîrokê re hevrû bibe û di vê çarçoveyê de nêzî pirsgirêka kurd bibe û çareseriyan biafirîne.

Gava yekemîn ji ber Qirkirina Zîlanê lêborîna xwe bixwaze (Di heman demê de ji Qirkirina Dêrsimê û yên din jî) û Çemê Zîlanê bibe muzeyeke servekirî. *(Bi dawî bû)*

## Rêbazên Qirkirina Zîlanê

Pêkanînên hovane yên di Qirkirina Erdîşê de mirov dikare wiha rêz bike:**1-**Bi hezaran kurd ji bo nekevin destê leşkerên tirk û neyên qetilkirin reviyan çiya û daristanan. Bi rojan birçî man, hin ji wan jî di wan şertên dijwar de jiyana xwe ji dest dan.**2-**Extiyar, zarok, ciwan, jin hemû kesên destê leşkeran li navenda gundan dihatin berhevkirin û gulebarandin.

**3 -**Bi sungî û kasatûrayan zikê jinên ducanî diqelaştin, zarokên ne welidîbûn jî dikuştin.**4-**Tecawizî jin û keçan kirin. Bi sedan keç berhevkirin û birin cihê ne diyar, careke din der barê aqûbeta wan de agahî nehat girtin. **5-**Xanî, axur, zevî şewitandin. Dest danîn ser tiştên bi qiymet. Eraziyên aîdî gundiyan ji aliyê dewletê ve hatin desteserkirin.**6-**Bi salan nehiştin gundî bikevin çemê Zîlanê. Hê jî ev qedexe berdewam dike û erazî di bin kontrola dewletê de ye.**7-**Serhildêrên dihatin girtin çavên wan derdixistin, serê wan dihat jêkirin û gund bi gund digerandin.

Qirkirina Zîlanê wiha pêk hat. Ev komkujiya ku hê jî di hişan de zindî ye bû sedema can û malên bi hezaran mirovên sivîl. Ev hemû jî nîşan dide ku Serhildana Agiriyê çawa hatiye çewisandin.

## Kurdan efû dikir, tirkan ew dikuştin

Di roja me ya îro de ji ber pirsgirêka kurd pevçûnên dijwar diqewime. Gelê kurd ji bo mafên xwe serî hildaye, dewlet jî hewl dide bi xwînê biçewisîne. Di van pevçûnan de dewlet li hemberî cenazeyan bi awayekî hovane tevdigere, nêzîkatiya wê ya ji bo êsîran di çarçoveya hiqûqa şer de divê nirxandin bêne kirin. Di van mehên dawî hovîtiya li hemberî cenazeyên gerîlayên PKK'ê dibe sedema nerazîbûnên mezin. Di heman demê de gelek caran hatiye selmandin ku PKK'iyên bi birîndarî an jî saxî hatine girtin, hatine înfazkirin.

Gelo ev di nava çend salên dawî de bi pêş ketiye? Bersiva vê pirsê 'na' ye. Ji bo vê bibîranîna çend bûyerên di Serhildana Agiriyê de bes in. Di serhildana Agiriyê de nêzîkatiya ji bo êsîran hatibû rojevê. Îhsan Nûrî di pirtûka xwe 'Serhildana Çiyayê Agiriyê' de wiha dibêje: "Fermandariya kurd bi belavokekê ji raya giştî ya cîhanê xwest ku li hemberî qewimînên li herêmê bêdeng nemînin û mudaxeleyê bikin." Di belavokê de wiha hatiye destnîşankirin; kurdan leşkerên tirk ku ji bo kuştin û qirkirinê hatibûn esîr digirt û bêyî ku wan bikuje serbest berdide, beranberî vê tirkan zarokên kurdan bi hovîtî qetil dikir, ligel vê yekê ji tirkan re medenîw û ji kurdan re jî hov tê gotin. Gelov ji van kîjan medenî û kîjan hov e. Îhsan Nûrî, di pirtûkê de ji bo rewşa leşkerên tirk wiha dibêje: "Leşkerên êsîr min şand gundê Kurdava ku ez lê dimam. Roja din du şervanan ev êsîr birin sînorê Îranê û teslîmî leşkerên Îranê kir. Tam dema êsîran ji Kurdava bibirina yek ji wan gora lingê wî qetiyabû. Jineke bi navê Horik ku vê rewşê dibîne, ji bo leşkerê êsîr necemide gora lingê xwe derdixe dide wî. Ev mînaka biçûk jî nêzîkatiya kurdan ji bo êsîrên tirkan çiqas mirovîne nîşan dide. Lê tirkan dema fêm dikirin her kurdê ku girêdayî Agiriyê ye ew dikuştin."

# Yildiz: Ma çîyê ke pawit girot

**Yildizî ard ziwan ke, kudîy referandûmî di fînalî ravêray. Ney ra pey maneno ke rayîrberî vengê kurdan bigoşdarnê û di zagonan di waştişêy înan bi ca biyarê. Çimkî kurdan xo bi boykotî îspat kerdîy ke xoserey xwo mohr kerdîy**

**ÊLÎH - ANF** Wekîla BDPî û sereka grûbî Bengî Yildiz ard ziwan ke, encamê ke referandûmî di pawitê giroto û vat: " Ti probleman am bi erê ra çîno. Ma waşt ke bal boncê encamê bertekan kurdan sero. Bi ney hawayî zî berteka xo nîşanê AKP day ke sîstemî ra îtîraz kenêy. Ma wazenê ke wa no mesaz bêro girotiş."

**BDP rayanê xo zaf kerd**

Bengî ard ziwan ke BDP rayanê xo zaf kerdo û vat: "Ma encamê ke referandûmî di pawitê bi xebatanê xo girot. Ma di weçînayişî di sifte seyî ra mîyanê 35-65 pawitê, encama ke vejya taxmînanaê ma ra zafêrey vejya. Weçînayişê 2007 di zafêreya mediman şîybîy kar. Di ney weçînayişî di merdimî zafêrey semedê roşanî pêhet bîy. Roşanî merdiman arê jû cayî kerd. No çî AKP ra zî bi feyde bi. Rayna zî hintayê zext û zordareya ke şarê ma sero bi û şarê ma bi zî, şarî encamê dê weş da ma. AKP se kerd zî esasê şarê ma nêşikya cayê ci ra bikera. No serkewtişê şarî bi û BDPî yo."

Bengî ard ziwan ke, muşahîtanê BDP aşmî vero ra ze endamê KCK yê amey mojnayiş û vat: "Muşahîtanê ma di ney çarçevoyî di amey binçimkerdiş. Kurdî bi îtîraza xo sîstemî red kerd û bala heme kesan ant xo sero. Ravêrayişê an nêravêrayişê zagonî mara muhîm nîyo. A muhîm îtîraza boykota kurdan ya sîstemî yo.

Kurdan vat şima mecbûrê ke ney ra pey ma bivînê. Ney ra pey mecbûrê ke waştişê kurdan şima bigê çiman vero û bîyarê ca."

# Bonî sero nîşanê mi girotîy

Ferhat ARSLAN
DÊRSIM / DÎHA

Alî Pîr Okdemîr (25) kiştê leşkeranê ke vejyya operasyonî ra ame birîndarkerdiş. Goreya ke Okdemîr vano, o waxta ke bonî sero bîyo leşkeran nîşanê ey girotêy. Qabê ney wazeno ke derheqê berpirsîyaran di cipersis abiko.

Dewa ke girêdayeyê navenda Dêrsimî Havsîk (Bogurtlen) di leşkeranê ke vejyay operasyonî bi çekî Alî Pîr Okdemîr bonê ey sero baskê ey ra birîndar kerdîy. Okdemîr kişta malbata ey ra berdîy nêweşxaneya Dewletî ya Dêrsimî girotîy binê dermankerdişî.

Okdemîr debera xo bi heywanweykerdişî keno. Goreya ey serê sibayî saet demanê 05:30 di qabê ke em bido heywananê xo vejyawo teber ke bişêro axorî û vat: "Ez qabê ke em bidî heywananê xo dormeyê 05:30 di vejyawanê terber ke bişêrî axor û înan mird bikerî. Ez waxta ke şîya axor tilî ra vengê 2 kutikan ameynê. Pey ra mi leşker vîna. Ez şîya mi em da heywanan. Kişta bînî de zî qabê ke leşkerî gule merzê mi ra ez tersana erey axorî ra vejyawa. Ez waxta ke vejyaya teber ey demî di leşkeran gule eşt mi, mîyanê ma di 25-30 metre encax bi."

Ez o doz abikî

Okdemîr ard ziwan ke bi di guleyan pey ra kewto war û vat: "Ez o derheqê leşkeranê ke gule vera mi day di şîkayet bikerî û doz abikerî. Dewî mîyan di mi day guleyan vero. Di guleyî zî ginay baskê mi. Guleyî baskê mi perçe kerdîy. Eger leşker merdimanê sivîlan wina bido guleyan vero se dê sivîlî nêşikyê kêyanê xo ra bivejyê teber. Ney ra pey ma bi tersa ke gule varadê ma ra bicuyê. No psîkolojî zaf qilêrin o. Ma debara xo bi heywanan kenêy, ma mecbûrê ke bigeyrê. Ney ra ez o doz akerî."



Ney mîyan di ma aşmê verê Koyê Bûyer Babayî di helîkopterîy şiwanê Remzî Karakûşî 2 saetan çarnabi û giran birîndar kerdîbîy û şûrê xo vinî kerdibî.

# Dêrsim veşeno rayîrberî ewnîyenê

**DÊRSIM - DÎHA** Qeza Dêrsimî Ovacix dewa Bîrdo (Karaoglan) di şewata daristanan xo resna sînorê Hozatî ema rayîrberî qabê ke bitefînê çîyê zî nêkenê. Eger no şewat rojavayî di bibîya qîyamet bivisyay.

3 roj verî di paştîdayişê operasyona hewayî ya bejayî di, daristananê dewa Bîrdo veşnay. Daristan 3 rojo ke veşeno. Veşayişê daristanî xo resna sînorê qeza Hozatî. Goreya ke yeno vatiş şewat Ovacixî ra weş eyseno û her ke şino şewat xo verê Hozatî keno û veşeno û hîra beno.

Kesîy nêşenê xo biresnê şewata daristanî. Rayîrberî zî hetanê ney gamî bêveng mendêy û mudaheleyê şewatî nêkenêy. Daristan veşeno û rayîrberî goş û çimanê xo girotêy hinî ewnîyenê. Her ki şino şewat daha hîra beno.

Kişta bînî de zî, Zozana Alîbozan ya girêdayeyê Hozatî yo çend rojan verî, semedê Operasyonan veşyabi û ca de zî, hewna mudaheleyê rayîrberan ya tefînayişî çîno. Şewat hewna berdewam o.

Şarê mintiqayî her ke şino berekanê xo semedê nêtefînayişê adirî berz kenêy. Û wazenê ke wa operasyonî bêrê vindarnayiş ke daristanî nêveşyê. Kişta bînî de zî anê ziwan ke, eger no şewat rojavayê Tirkîya di bibîyay se dê bi helîkopteran û balafiran dê ney bitefînay. Ema tîya Dêrsim o warê kurdan o, çiçî bibo mubah vînenê û vatîy: "Rayîrberî nêzanê ki pişikanê (cîgeraspe) xo veşnenê. Bêro di dê bê oksîjena xo veşnenê ra dê nêweş bikûrê. No çî nîno qebûlkerdiş. Çîyê ke Tirkîya ma sero keno bes o. Wa rayîrberdîy bi lez ney bitefînê. Ma nêresenê ey cayan. Lazimo ke dewlet operasyonan bivindarno û şewatan bitefîno. Hetanê ke operasyonî bibêy dê şewatî bibêy. Ma nêwazenê ke amayişê gedeyanê xo daristanan kes an zî leşkerî biveşnê."



# Kurdan xoserey xo bi boyqotî mohr kerd

EHMEDÊ BIRA

Heme kes wazeno xo di çarçevoya zagonan di xo û dormeyê xo bi rayxitiş bikero. Kurdîy zî wazenê ke ney ra pey dayişê heq û mafanê înan di, wa xapeynayişîy çînê bê. Waştişê kurdan ya sere, heme çîyî wa bi zagon/qanûn bibê yo. Wa qanû/zagon di asta merdimanê azad di, kurdan û merdiman azad bivîno û welatê ke tederê di her warî di biratey û waştişê şaran bigo çiman vero tim û tim berz bikero.

Kurdîy nêwazenê bi kes an kesan zilm bikerê. Ney ra waştişê kurdan, tim û tim homaîstey û merdimahey o û wazenê ke heme dinya di aramey mîyan di bicuyê yo. Çîyanê ke wazenê bê weşeya welat û merdiman ra avêr çîyê nîyo.

Kurdan qabê ke xo di zagonan di bivînê ra, referandûmî di vatî ma nêşinê sandoqan sero û ma boykot kenêy. No şîyiş hemeyê Kurdistanî di bi serkewtiş peynî bi. Kurdîy nêşîy sandoqan sero û boyqot kerdîy. Boykota ke kurdan kerd resa encamê xo û ravêra. Tikey cayan di seyî ra nezdî 100 nêşîy sandoqan sero. Bi gilokin seyî ra 67 nêşîy sandokan sero.

Bi gilokin merdim şikyeno vajo weçînayişê ke bêro di eger şert û mercî wina ravêrê û BDP daha zêd xebatanê xo weş bikero se, hemeyê Kurdistanî di seyî ra 67 ra dê bireso 75 an. No zî çîyê de zaf weş o. Eger BDP tikey daha zor bido xo û xebatanê xo daha zêd biko û daha zêd gura şarî bikero se û xo mîyan di biryarê bibo û karanê ke yenê kerdiş sifteyineyî bido karê şarî se, dê BDP çend aşmanê verê weçînayişa ke bêro di bibo partîya gird ya Tirkîyayî yewêr. Belkî weçînayişê verê ma di wekîlanê xo biresno 40 heban.

Kurdan fînala xo ya peynî da. Encam gora ke zext û zordareyanê ke kurdan sero bîy û dom kerdîy, zaf weş ravêra û ze ke kurdîy vajê ma Xosereya Demokratîk îlan kerd û vatî ma rayîra Xoserey di gaman erzenê. No gam eger weş bêro famkerdiş û weş bêro vînayiş se, qabê dewlet û zewnbînan zaf muhîm o. Ney ra pey, dê heme kesîy bizanê ke, kurdîy di fermey de zî kurdanê verî nîyê. Kurdîy hetanê ke mafanê xo yê demokratîk û homayizmî mêgê se fek xebatanê xo yê azadîy ra vera nêdanêy û dê daha gurtirey xebatanê xo bikerê.

Hemeyê Tirkîyayî di 49 milyon 446 hezar 369 kesîy kesanê gere bişîyê sankoqan sero estêy. Di encamî di qiraxa Behraspeyî di 'nê' vejya. Di pey qiraxê Behraspe di zî zafêrey 'erê' vejya. Herêma kurdan de zî boykot vejya. Dêrsim gura partîya BDP nêkerd û ûca de zî 'nê' vejya. No çî kişta BDP ra çîyê nêweş bi. Encam kişta BDP ra gere bêro nixnayiş û Dêrsimî di semedê ke boykot ser nêkewt ra kombîyayişî ûca di gere bêrê viraştiş.

Yanê ma şikyenê vajê ke, heme kesîy di herêma xo di resay encama xo. Kesê ke vinî kerdîy nêbîy. Hemeyan goreya xo qezenç kerd. Çimkî hemeyî qabê weçînayişê 2011 di rayanê xo zêd bikerê ra xebatanê xo bi tûnd day meşayiş û xo ceribnay.

Hemeyî zî herêma xo di serkewtebîy û kesanê ke pêroyinê Tirkîya di şîy sandoqî sero ra, seyî ra 58 înan vatîy 'erê', seyî ra 42 ci zî vatîy 'nê' vejya. No goreya mi têkey bo zî kewtişê AKP yo. Çimkî AKP partîyê de hikûmat o, gere daha zêd bigirotaynê. Çimkî zaf kesîy nêşîye sadoqan sero. Eger êy kesî zî bişîyay goreya mi dê encama 'erê' yan bikewtayê 35 î. Belîyo AKP goreya weçînayişanê verî kemî kerdo. Çimkî di ney weçînayişî di hesaba boykotî û kesanê ke nêşîyê sandokan sero bikerê se halê AKP goreya mi îcabê nixnayişî keno. No çî weçînayişê bêro di dê daha weş bieyso.



## Remayeyê hela teng

*Vera zaliman*
*Bêdest û bê ziwan o.*
*Mîyanî zeîfan di gefan*
*şan o*
*Ti vanî de hey kam o.*
*Vaje, keyeawan!*
*Ti ganî*
*Ling erd ro*
*şanî vera zaliman*
*Bibî hemderdê mazlûman*
*Belê!*
*Camêrdo namedar*
*Ca ame*
*serewişk û rikdar*
*Ca ame*
*zertenik û rehmwar*
*Vera zaliman serewişk*
*Mîyanî mazlûman de*
*nefsşenik.*
*Sereyê xo ano war.*
*La,*
*Remayeyê hela teng*
*Ne sewtek, ne zî veng*
*Ne ardî û ariş*
*Ne zî arê û deng*
*Bê şarme û bê heya*
*Nêzana çira ciwîya?*
*Mîyanî namedaran de*
*Muhtacê yew çeng.*
*Vate*

W. K. MERDIM

www.arsivakurdi.org

# Mirovekî dewlemend û yekî xizan

NAÎL DEMÎR

Mirovê dewlemend mirovekî zulimkar û serdest bûye. Her tim û dayîm li gundî, cîran û xizmên xwe zulm û zordarî dikir. Piştî dem dirêjiya salan ew bi nexweşiyeke giran dikeve û dimire.

Malbata wî pîştî ku ew birin xistin gorê, dûre kurê wî ji xwe re dibêje: Bavê min bi saxî bi naxweşiyeke giran ket, pir êş û ezîyetkişand. Gelo ew ê di gorê de çawa bike û ew ê çi werê serê wî. Ew diçe mirovekî xizan dibîne hinek pere yan jî zêran dide wî û jêre dibêje ez ê li tenişta mezelê bavê xwe çahlekê bikolin û di navbera çahlê û mezel de kulekekê vekim.Tu jî têkeve çahlê hetanî sibehê tu di kulekê de li bavê min temaşe û guhdarî bike; rewş çawa derbas bibe tu yê sibehê ji min re bêjî. Mirovê xizan pewlê wî dipejirîne û diçe dikeve çahlê û di kulekê de li mirovê mirî dinêre roj dere ava û şeva reş bi ser wî de tê.



-Ezraîl, tê ku pirs û sûala ji mirovê mirî bike, dinêre ku li tenişta gora wî çahlek kolane di navbera çahlê û mezel de kulekek vekirine û mirovekî sax dî wê kulekê de li mirovê mirî temaşe dike. Ezraîl ji xwe re dibêje ji xwe evê mirî, miriye bi tu deveran ve nikare here çi wext be ez ê werim pirsa pêkanînê wî ji wî bikim ew bila niha bimîne hela çi kar û îşê ev ê sax li vira heye, pirtûka wî vedike wî hetanî serê sibehê pirs û sûala ji wî dike, wî di binê lêdan û kotekon re derbas dike, jê re dibêje êdî tu careke din zilm û zoriyê li pîreka xwe neke dayik û bavê xwe jî aciz neke bi halekî xirab û perîşan şefeq li wî derdikeve Ezrail bi şûn de vedigere ew jî ji acizbûna bi halekî xirab û perîşan şeveq li wî derdikeve Ezrail bi şûn de vedigere ew jî ji çahlê derdikeve û direve tê cem kurê mirovê mirî.

> Ji xwe gunehê bavê te zêde ne wî gelek keda mirovan xwariye. Zilm û zorî jî kiriye ew ê îşev bavê te ji kerekî bêhtir dar û kotekan ji destê Ezraîl bixwe û ew ê berdêla pêkanînên xwe bide

Kurê mirovê mirî pirs û sûala bavê xwe dike û dibêje gelo îşev.

Şeva bavê min çawa derbas bû ji wî dipirse.

Tiştikû bi serê wî de hatibû ji serî de hetanî binî tevde jê re got, dîsa jê re got, ji xwe derbasî cem bavê te nebû destpêkê hat cem min. Pirtûka gûnehê min vekir. Ji min re got,vaye te mafê pîreka xwe xwariye, te guhdariya dayîk û bavê xwe nekiriye û te ew gelekî aciz kirine, ji bona wan hetanî şeveqa sibehê bi dar û kotekan li min da.Her çiqasî min jê re got ez mirovekî xizan im min malê tu kesekî nexwariye, min zilm û zor li kesekî qet nekiriye. Wî guhdariya min nekir û lêdana xwe berdewam kir.

De îcarê em werin ser bavê te. Îşev hema şev tarî bibe ew ê Ezrail were ser mezelê bavê te û ew ê di wê kulekê re derbasî cem wî bibe ew ê pirtûka xêr û gunehê wî veke ji xwe gunehê bavê wî veke ji xwe gunehê bavê te gelekî zahfe wî gelek keda mirovan xwariye. Zilm û zorî jî kiriye ew ê îşev bavê te ji kerekî bêhtir dar û kotekan ji destê Ezrail bixwe û ew ê berdêla pêkanînên xwe bide…

## Qerf Henek

### Axirê wê jehrê xwar




### Îradeya gelê kurd derket pêş




## Bablîsok

*ez kulîlk im*
*kulîlka ku*
*ji sînga Zagrosan*
*diteqim*
*û dibişkivîm*

*giyan bûm*
*jiyan bûm*
*pel didam*
*û şîn dibûm*

*hemû qîz û xortên*
*ciwan*
*li xwe civandin*
*ref bi ref*
*ber bi min ve dihatin*

*dane ber bozê xwe*
*û kişandin ser dilê*
*xwe*
*lê dîsa negotin bes e*

*ez carinan sor bûm*
*carinan zer bûm*
*carinan kesk bûm*
*û carinan jî bêhn bûm*

*carinan li Bakur*
*carinan li Başûr*
*carinan li Rojhilat*
*û carinan jî li Rojava*

*weke ba û bahozê*
*weke bablîsokekê*
*li dora dar û deviyan*
*weke mizgîniya aza-*
*diyê*
*ber bi te ve hatim*
*û şax didam*

*ez di nava xaka*
*derguşa Mezopotamya*
*de*
*kulîlkeke aştiyê*
*li ser destê dayikan*
*bûm stêrk*

*ez xweşikbûna*
*zarokên rojê bûm*

**Orhan ORAK**





Îkram Balekanî
balekani@hotmail.com

## Te go çiii?

Min got merheba ji bejn û bala we re…

Mirov fêm dike ku ji bo çi tirkan di referandûmê de digotin, erê yan na. Lê hin kesên tirşikçî jî çav berdabûn binê beroşa AKP'ê û bi gotinên pûç digotin, ne bes e, lê erê. Yanî çi, ne bes e lê erê. Mêrik te înkar dike; tu dibêjî ne bes e.

Kesên ku digotin "Ne bes e, lê Erê", yan nexweş in, yan xwe firotine, yan jî xayîn in.

Ji ber ku mirov fêm nake ji çi re dibêjin ne bes e. Gelo dixwazin bêjin; hûn me înkar dikin, ne bes e, zimanê me qedexe ye, ne bes e, navê welatê me qedexe ye, ne bes e, navê gul, giya, çol, çiya û dar û berên me qedexe ye, ne bes e, em girtî, penaber û der bi der in, ne bes e, lê dîsa jî emê bêjin erê. Ma ev qas jî nezanî dibe! Gotineke kurdan heye dibêjin: Aqilê sivik barê giran e. Bi rastî jî wisa ye. Yanî çi, ne bes e lê erê! Erê û barê kerê. Tobe tobe. Îja bêyî ku fedî bikin, digotin, em nabin dûvkê PKK'ê, emê bibin dûvkê AKP'ê. Xwedê nehişto, hema bila bi kurtî bigotina kerem bikin li me siwar bin û xilas.

Hemû sîstema tirk, tevî walî, polîs, MÎT, TÎT, ÎT, xwefiroş û yên kirêkirî, yanî tirşikçî û tevî karmendên dewletê bibûn yek li dijî gelê kurd dixebitîn da ku wan bixapînin û bibin ser sandoqê. Ne xem e ku bêjin erê yan na. Tenê dixwestin ku boykotê bişkênin. Lê bi ser neketin. Rayedarên BDP'ê ew qas şirîn û xweş digotin BOYKOT, muxalifet jî kete bin bandora wan.

Bo nimûne Serokê CHP'ê, Kemal Kiliçdaroglu jî referandûm boykot kir û dengê xwe bi kar neanî. Ez bawer im di jiyana xwe de cara yekem tiştekî baş û qenc kiriye. Wekî hûn jî dizanin, xala 66'an a destûra Bingehîn a Tirkiyeyê dibêje, kesên ku hemwelatiyên Tirkiyeyê ne, tirk in. Yanî kurdan înkar dike. Ne tenê kurdan her kesî. Kiliçdaroglu jî ditirse ku aşkera bêje ez kurd im, bi xêra kurdan, bi riya Boykotê dilê xwe rehet kir û got ez ne tirk im. Lê tirşikçiyan jî gotin ne bes e, lê erê em tirk in. Ew êdî bûne dûvik û barkêşên AKP'ê.

Kesên ku pîsikek wan tuneye, gotin em tirk in. Êdî wê çawa bi navê kurdîtiyê li deriyê xelkê bidin û çawa doza kurdîtiyê bikin.

Dema mirov li çapemeniya tirk dinêre, mirov dibêje qey hemû gelê Kurdistanê çûye ser sandoqan. Mesele dibêjin Colemêrgê %93 Erê. Malmîrat, ziravê mirov diqete. Lê dema mirov li rastiyê dinêre, xelkê Colemêrgê %94 gotiye boykot. Yanî sedî 94 neçûne ser sandoqan.

Yan jî bajarê Dêrsimê. Her kes dibêje qey Dêrsim hemû çûye ser sandoqan û gotiye "Na", Na heyran ne wisa ye. Tenê di nava kesên ku çûne ser sandoqan de, rêjaya "Na" li pêş e.

Ka ez mînakeke biçûk ji referandûmê bidim; da ku hinekî dil û hinavê me hênik be û baş bê famkirin Mesele bajarê Mûşê, navçeya Gimgimê. Li taxa Alangoza Jêrê dema jimartina dengan tê. Şeş kes wekî çavdêr li ser sandoqan disekinin. Dema sandoq vedibin, lê dinêrin ku tenê 4 kesan deng daye. Yek ji aliyê polîsê çavdêr ve û 3 deng jî ji aliyê niştecihên taxê ve hatiye bikaranîn.

Îja ka em binêrin li gorî rêjeya dersedî çawa ye.

Tê gotin ku 6 kesên li ser sandoqê bi baldarî 4 deng jimartine. Sê kesan gotiye "erê" û kesekî jî gotiye "na". Yanî li gorî vê yekê ku em bi zimanê çapemeniya tirk biaxivin, ji sedî 75 Erê, ji sedî 25 Na. Lê ya rastî ne wisa ye. Ya rastî wiha ye: Her kesî Boykot kiriye. Tenê 3 kesan gotiye erê û kesekî jî gotiye na. Yanî ji sedî ji medî tuneye. Tenê 4 kesan deng daye loma.

Yanî ku li Kurdistanê, em ÎT; MÎT'an hisab nekin, kurd neçûne ser sandoqan.

Jixwe ku ji sedî 100 bêjin Boykot ne mumkin e. Ji ber ku li Kurdistanê her der tijî bûye ji "ÎT, MÎT; TÎT, JÎTEM, Jandirma, Polîs, leşker û wezîfedarên dewletê. Ev jî ne bes bûn, niha jî hinek barkêş ji xwe re dîtine. Bi boykotê re derkete holê ku ti kes nikare bê PKK û BDP'ê li Kurdistanê hespê xwe bibezîne. Yên ku siwar bên, wê peya herin...

www.arsivakurd.org

# Pirtûka 'Çar îdam, şahidek' derket

Pirtûka "Çar îdam, şahidek" a Rojnamevan Akin Bodur nivîsandiye, piştî 30 sal derbas bûn,aliyên 12'ê Îlonê yên nayên zanîn ronî dike. Pirtûk sendroma 12'ê Îlonê vedibêje

**HATAY / DÎHA -** Rojnamevan Akin Bodur ku gihîşt nameyên girtiyên di dema 12'ê Îlonê de li herêma Çukurovayê hatin darvekirin, piştî 30 salan gihand malbatên wan. Pirtûka rojnamevan Bodur bi navê "Çar îdam, şahidek" ê ku gelekî bûyerên nayên zanîn hildide rojameyê îro ji weşana Dogan Kitabê derket. Nûçegihanê rojnameya Sesê ya Îskenderûnê Akin Bodur, di pirtûka wî ya di salvegera 30'yemîn salvegera 12'dê Îlonê de hate weşandin de, çavdêrê darvekirinên 12'ê Îlonê jî piştî 30 salan diaxive. Di pirtûkê de, gotara Mustafa B. ê di dema 4 dardakirinên hikûmxwarên 3 ji wan çepgir, yek jî rastgir ên bi navê Serdar Soyergîn, Mustafa Ozenç, Alî Aktaş û Ahmet Kerse yên di dema 12'ê Îlonê de hatin jiyîn de wekî çavdêr li wir bû, bûyer piştî 30 salan ronî dibe û cih daye nameyên wan.

**Çavdêr ji ser xwe çûye**

Di pirtûkê de tê destnîşan kirin ku daxwaza Serdar Soyergîn ên di 26'ê cotmeha 1980'yan de li Girtîgeha Edeneyê ya berê tê înfazkirin, gihandina nameya wî ya ji malbata wî bûye. Çavdêr darvekirina Soyergîn wiha vedibêje: "Piştî kar hatin qedandin û ew ber bi darvekirinê birin, ji çavdêran Feyzullah E. ket erdê û ji ser xwe çû. Dibe ji tirsa be, dibe ji xemgîniyê be lê ez sedema wê nizanim. Li ser vê yekê min di înfazê de cîh girt. Şahidiya min a darvekirinê ya yekem bû. Tu çavdêran nedixwest biçin wir. Em hemû ji neçarî çûn. Di nava daxwazên Soyergîn de vexwarina rakiyê hebû. Û raki beyî av vexwar. Lê ev daxwaza wî neket girtînameyan."

**Di rojbûna xwe de hate îdamkirin**

Di pirtûkê de xala darvekirina xwendekarê pola dawî ya Lîseya Îskenderunê Alî Aktaş jî, di 27 saliya xwe de di rojbûna xwe de, piştî derdora Girtîgeha Edeneyê bi qamyonên leşkerî hatin girtin, hatiye darvekirin. Di pirtûnameyê de hate parastin ku ji bo Aktaş nameya xwe ya darwî binîvîse dema wî hatiye dirêjkirin, lê tê gotin ku ji Aktaş xwestine nameya xwe kin binîvîse.

**Celladan rûpoş bi kar neanîne**

Şahidê 4 darvekirinan Mustafa B., di pirtûkê de tiştên wê demê dîtine wiha vedibejê: "Celadên tabureyên hikûmxwaran kişandin rûye xwe negirtine. Wekî hemû şahidên darvekirinê rûvekirî tevgeriyane. Di her darvekirinekê de celladet diguherî. Min gelek caran xwest tiştên min şahidiya wan kir vêbêjim, lê min nekir. Yekîneyên şaredariyê jî cesedên kesên hatin îdamkirin ji girtîgehê birin û wekî digirtin, defindikirin. Ne vecîbeyên wan ên olî hatin bicîh anîn û cesedên wan jî nehatin şûştin û hatin definkirin."






## Hejmarên Hetawê ji nû ve çap kirin

**HEWLÊR -** Kovara Hetaw bi 13 bergan û 6 hezar û 500 rûpel de ji aliyê navenda "Jîn" ji nû ve hate çapkirin. Kovara "Hetaw" 188 hejmar di salên 1954'an heta 1960'î de li bajarê Hewlêrê çapkirin, ew yek ji kovarên bi navûdeng e di nav rojnamegeriya kurdî de ye.

Birêveberê binkeya Jîn Refîq Salih, der barê çapkirina kovara Hetaw de got ku ev proje hevbeş e bi dezgeha Mukriyanî re ya taybet bi çapkirin û belavkirinê. Her wiha Salih ronî kir ku komkirina vê kovarê ji aliyê navenda Jîn ve gaveke berev parastina wê çavkaniya girîng ji mirinê ye, zêdeberî gihîştina ber destê xwendevan bi hêsanî.

## Filmê herî serkeftî "Mad Men"

**LOS ANGELES -** 62'yemîn Xelatên Emmy li Şanogeha Nokia ya li Los Angelesê hatin belavkirin. Wekî par rêzefîlmê bi navê "Mad Men" îsal jî wekî Rêzefîlmê Herî Serkeftî hat hilbijartin.

Xelatên Emmy wekî Oscarên televîzyonan têne qebûlkirin. Şeva xelatdayînê ku ji aliyê Talk Showkarê amerîkî Jimmy Fallon ve hate pêşkêş kirin, di heman demê de wî showek jî kir. Fallon xwe xist şiklê Elton John, bû hunermendê rapê û stran got. Showkar bi lîstikên xwe reng da şevê.

Mad Men ku par Xelata Rêzefîlmê Herî Serketî girtibû îsal dîsa heman xelat bi dest xist. "Mad Men" di heman demê de Xelata Senaryoya Herî Serketî jî girt. Di beşa dramayê de Xelata Lîstikvanê Herî Serketî Bryan Cranston bi rola xwe ya di "Breaking Bad" de girt. Xelata Lîstikvana Herî Serketî jî Kyra Sedgwick bi rola xwe ya di "The Closer" de girt.

## Fîlmê 'Centleman' li sînemayê ye

**STENBOL -** George Clooney ku serkêşiya fîlmê 'Centleman/The American' dike di fîlmê de behsa çîroka kujerê kirêkirî derdixe holê. Fîlmê 'Gentleman/The American' û 'Paramparça' ku derhêneriya wî Nacî Çelîk Berksoy dike ketin vîzyonê. Derhêneriya fîlmê 'Centleman' ji Anton Corbijn dike di 12'ê mijdarê li Almanyayê dikeve vîzyonê.




Ku derhêneriya fîlmê Anton Corbijn dike û George Clooney,Violante Placido,Thekla Reuten û Paolo Bonacell di fîlmê 'Centleman/The American' behsa jiyana kujerê kirêkirî ragihandine perda spî.

Çîrok ku ji pirtûka Martin Booth a bi navê 'A Very Private Gentleman' ji bo sînemayê hatiye amadekirin. Mijara fîlmê 'Gentleman/ The American' wiha ye; 'Jack, yek ji kesên kujerê kirêkirî yê xedar tê nasîn e. Her piştî peywireke ku dikir, diçe Îtalyayê li bajarokê bêhna xwe dida. Bi Rahip Benedetto re hevlatî datine. Li bajarokê nêzîkî jîna bi navê Clara dibe. Jack, têkiliya wî ya ku bi Clara yê dest pê kiriye ji ber vê tekiliyê konsantrasyona xwe winda dike. Ev tişt jî ji bo kujerê kirêkirî ku bi xetere, wî dide dest.

**'Paramparça'**

Fîlmê bi navê 'Paramparça' ku derhêniriya wî Nacî Çelîk Berksoy kiriye vê heftê li Tirkiyê kete vîzyonê. Di fîlmê de lîstikvanên wek Ozan Çobanoglu, Kadim Yaşar, Ezgî Sertel û Fatîh Yurdakul dilîzin.Film di nav fîlmên reş yên serkeftî de wek berendam tê nişandan. Çêker-Senaryo Ozan Çobanoglu, Çêker Nalan Erkovan, muzîk Gurkan Çakici, derhênerê dîtbarî Eyup Kiliç kiriye. Çêkirina senaryoya fîlm sê sal berdewam kiriye. Çêkirina fîlm jî heşt hefte ne mijarê fîlm ji wiha ye:

Kujerê kirêkirî yê kevin Kemal, ji girtîgehê nû derketiyê û dixwaze dema xwe ya borî jibîr bike. Ji cîhana derve birevejî,bi vîcdan rehet nîn e. Ji bo jiyaneke nû bi alikariya hevser û keça xwe dest pê dike.

Lê ev kedera wî ya xirab dev ji berna de. Ugur ku kiriye heşê xwe vê tolê ji Omer bistîne, kesê ku li digeriya û Kemal dîsa vegeriya demên xwe yê tarî. Ji bo jiyaneke nû dê jiyana kesekî din bigire.

## Aretha Franklin wiha ferman da

**DETROIT -** Aretha Franklin, bi daxuyanek çapemeniyê xwest ku di fîlma ku ew ê jiyana wê vebêje de Halle Berry di rola wê de bilîze. Hunermenda efsanewî Anertha Franklin a 68 salî di daxuyaniya çapemeniyê de xwestekên xwe yên derbarê aktor û aktrîsên Hollywoodê yê di fîlma li ser jiyana wê vedibêje de bilîzin li pey hev rêz kir. Franklin got ku ew bawer dike dê Berry ew red neke û di fîlmê de Anertha Franklin bilîze. Farnklin xwest ku Danzel Washingtonê xelata Oscarê girtî jî di rola bavê Franklin de bilîze.

Hunermend ji bo rola yek ji hunermendên Motown plakê Smokey Robinsonî jî xwest ku Terrence Howard bilîze. Senaryoya fîlmê ku dê bê kişandin ji otobiyigrafiya bi navê 'Aretha: From these Roots- Aretha ji van kokan' ew ê bê çêkirin.

## Li Galerî Enlîlê dema pêşengehan

**HAMBURG -** Galerî Enlîl ku ev sê sal in li bajarê Hamburga Almanyayê xebatên xwe yê hunerî dimeşine, sezona pêşengehan bi pêşengeha wêneyên Halîl Keskîn da destpêkirin.

Wênekeş Halîl Keskîn ku pêşengeha wî ji 16 berheman pêk tê, çend roj berê bi beşdariya gelek hunerhezan bi kokteyleke pêşengeha xwe vekir. Wênekeş Keskîn, ku bi eslê xwe ji Çorûmê ye, di sala 1977'an de li bajarê Recklinghausena Almanyayê ji dayik bûye. Eleqeya wî ya bi wêne re yekem di sala 1999'an de li eyalata Californiya Amerîkayê dest pê kiriye.

Keskîn di cih da nebine ku berhemên wî tenê bi navê wêne bê naskirin. Ji ber ku mijara penturel ji heye. Hunermend dema ku wêneyin tazî dikşîne bi fikirên xwe ew boyax dike. Piştre jî li gorî estetîka hunera wêne di objektîfa xwe de bikar tîne.



2010
XELATÊN ROJNAMEGERIYA KURDÎ Û
ŞEHÎDÊN ÇAPEMENIYÊ YÊN MÛSA ANTER




MÛSA ANTER

XELATÊN ROJNAMEGERIYA KURDÎ Û
ŞEHÎDÊN ÇAPEMENIYÊ YÊN MÛSA ANTER

ŞERTÊN TEVLIBÛNÊ:

- Pêşbazî bi du zimanan ango bi kurdî û tirkî pêk tê.
- Xelat di 4 kategoriyên weke 'Nûçeyên bi kurdî', 'Nûçeyên bi tirkî', 'Fotograf' û 'Karîkatur' de tê lidarxistin.
- Ji bilî van kategoriyan dê Xelata Juriyê ya Taybet a Gurbetellî Ersoz bê dayîn.
- Di her kategoriyê de dê bi tenê xelatek bê dayîn.
- Di kategoriyên nûçe û fotografan de ji bilî berhemên ji pêşbaziyê rerasterast hatine şandin, dê berhemên desteya hilbijartinê jî pêşniyar kirine li ber çavan bêne girtin.
- Di her kategoriyên wekî, 'nûçe', 'fotograf' û 'karikatur' de xelatê pereyan dê bê dayîn û ji bo her yek ji wan 2 hezar û 500 TL ye.
- Endamên juriyê û xebatkarên rojnameyên 'Gunluk' û 'Azadiya Welat' nikarin tevli pêşbaziyê bibin.
- Berhemên ku bêne şandin an divê nehatibin weşandin an jî piştî 20'ê îlona 2009'an hatibin weşandin.
- Berhemên bêne şandin divê herî dereng heta 14'ê îlona 2010'an bigihijin ber desteya hilbijêr.
- Her kes bi tenê di kategoriyekê de dikare tevli pêşbaziyê bibe.
- Berhemên ku ji bo kategoriya 'nûçeyan' tên şandin divê bi 5 nusheyan bigihijin ber destê juriyê.
- Li ser berhemên wekî; karikatur û fotografan kunye hebe. Ango li pişta fotograf an jî karîkatur li quncikê çepê yê jêr etîketek hebe û li ser (navê fotograf, çima hatiye çêkirin an jî kişandin, kengî û li ku) agahiyên esasî cih bigirin. Divê berhem bi mezinahiya 18x24 cm û rengîn an jî reş-spî bin.
- Navên ên ku xelat qezenc kirine dê di 15'ê îlona 2010'an de bên aşkerakirin. Xelat dê bi merasîmeke mezin di 20'ê îlona 2010'an de li xwediyên wan bên belavkirin.
- Berhemên hatin li xwediyên wan nayên vegerandin û dê di rojnameyê de bêne weşandin.
- Namzet divê kurtejiyana xwe ligel berhemên xwe û fotografê xwe ji navnîşanên jêr re bişînin.

JURIYA NÛÇEYÊN KURDÎ:
Mazhar Gunbat
Mesûd Hamîd
Leyla Ayaz
M. Alî Ertaş
Tayîp Temel

JURIYA NÛÇEYÊN TIRKÎ:
Huseyîn Aykol
Ertugrul Kurkçu
Fatîh Polat
Berat Gunçikan
Ahmet Tulgar

JURIYA WENÊYAN:
Ramazan Ozturk
Gultekîn Tetîk
Îsa Çelîk
Çerkes Karadag
Hacer Persîdat

JURIYA KARÎKATURAN:
Tan Oral
Gulay Batur
Ender Ozkahraman
Sarkis Paçaci
Halîl Încesu

*Xelatên Rojnamegeriyê û Şehîdên Çapemeniyê yên Mûsa Anter, 1993 - "Özgür Gündem", 1994 - "Özgür Ülke", 1995 - "Yeni Politika", 1996 - "Demokrasi", 1997 û 1998 - "Ülkede Gündem", 1999 "Özgür Bakış", 2000 - "2000 - Yeni Gündem", 2001 û 2002 - "Yedinci Gündem", 2003 - "Yeniden Özgür Gündem", 2004, 2005 û 2006 - "Ülkede Özgür Gündem", 2007 - "Gündem", 2008 Azadiya Welat û Alternatîf, 2009 Azadiya Welat û Günlükê dan.*

NOT: Xelat dê bi merasîmekê li Amedê ji xwediyên wan re bên dayîn.

**'Nûçeyên bi kurdî' jî dê ji vê navnîşanê re bêne şandin:**

'Nûçeyên bi kurdî' jî dê ji vê navnîşanê re bêne şandin: Huzurevleri Mah. Dr. Sıtkı Göral Cad. 13. Sok. Yeni Bina Kürtçe Dil Kursu Kat: 2 Kayapınar / DİYARBAKIR Tel: (412) 237 48 91 Fax: (412) 237 48 89

**'Nûçeyên 'bi tirkî', 'karikatur û 'fotograf' dê ji vê navnîşanê re bêne şandin:**

Nûçeyên bi tirkî, karikatur û fotograf' dê ji vê navnîşanê re bêne şandin: Şehit Muhtar Mah. İstiklal Cad. Mis Sok. Umutcan Apt. No: 19/4 Beyoğlu / İSTANBUL Tel: (212) 244 13 85 Fax: (212) 244 09 41

Rupel 12+++++:Layout 1 13.09.2010 13:38 Page 1


# Rojeva Welat

14 Îlon 2010 Hejmar: 7 Sal:1

www.welat.com

ROJEVA WELAT
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü:
Sevim KAPLAN

Yönetim Yerî:
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88

Yayın (Weşan)
TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81

Edene: Arslan Güneydoğu
Gazetecilik, Matbaacılık,
Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.


## DYA bû şampiyonê FIBA 2010'ê

**AMED** - Di lîstika fînalê de ya Şampiyoniya Cîhanê ya Basketbolê (FIBA 2010), tîma DYA'yê li hemberî Tirkiyeyê 81-64 bi serket û bû şampiyonê cîhanê.

Lîstikên Şampiyoniya Cîhanê ya Basketbolê (FIBA 2010) di encama têkoşîneke mezin de bi dawî bû. Di lîstika fînalê de ku li Stenbolê pêk hat de, tîmên DYA'yê û Tirkiyeyê hatin hemberî hev. Tîma DYA' yê 81-64'an bi serket û bû şampiyon.

Beriya lîstika fînalê, Litvanya li hember Sirbistanê bi serket û bû sêyemîn. Tîma Arjantînê jî li hemberî Îspanya bi serket û di rêza pêncem de cihê xwe girt. Şampiyoniya Cîhanê ya Basketbolê (FIBA 2010) ku 28'ê tebaxê li Stenbolê hatibû destpêkirin, du heftyan ajot.

## Kesên xwedî zarok di stresê de ne

**LONDON** - Li Îngilistanê di encama lêkolîneke ku li ser 87 kesî pêk hat de, derket holê ku kesên ku xwedî zarok in, li gorî kesên ku di temenê wan de zêdetir di stresê de ne.

Li Îngilistanê li ser dê û bavan lêkolînek pêk hat. Ji sedî 39 jin û ji sedî 12 mêr ku xwedî zarok bûn rîska depresyonê zêdetir li ser wan hebû. Ev rîsk heta ku zarokên wan bên temenê 12'yî didome. Lewre di sala ewil a zaroka de ev rîsk pirtir e. Di dawiya vê salê de ev rîsk di jinan de nêvî û di mêran de jî ji 4'î yek kêm dibe. Ji Konseya Lêkolînê ya Tibî ya Londonê Irwîn Nazareth diyar kir ku sedema vê depresyonê pirsgirêkên xewê ne. Her wiha got ji ber ku berpirsiyariya dê û bavê zêdetir dibe stres jî zêde dibe.



## Bermahiyên 12 hezar salî hat dîtin

Mirov beriya 12 hezar salan dest bi li dar xistina mîhrîcanê kirine. Arkeologan li Israîlê di kolaneke de fosîlên 12 hezar salî yên heywanan dîtin. Lê derket holê ku fosîlên han ji fosîlên din cudatir in û aîdî mîhrîcanekê 12 hezar sal berê ne.

Hate diyar kirin ku piraniya fosîlan aîdî hewyanên wek çelêk û kosî ne û hestiyên wan jî bermahiyên piştî mîhrîcanekê ya wê demê ne. Hate diyar kirin ku 12 hezar sal berê morivahî di serdama kevirên sîqalî bûn herî zêde çandiniyê pêk dianîn.

Zanyaran diyar dikin ku ev nîşaneyên mîhrîcana herî kevn a tê zanîn in. Zanyar diyar dikin ku bi derbas bûna serdema çandiniyê festîval û rîtuelên bi vî rengî jî zêdetir bûne. *(hawar net)*



# Pirtûk çiqas pir bin zarok ewqas jîr in



### Di lêkolîna li ser serkeftina zarokan a li dibistanê de ku li 27 welatan ji aliyê zanyaran ve hatiye kirin derket holê ku zarokên li mala wan pirtûk hebin serkeftîtir in



**NEVADA** - Zanyarên pedagojiyê bi salan teoriyên xwe yên li ser serkeftina zarokan bi dê û bavên wan ê xwendekar rawe dikirin. Lê li gorî lêkolînên zanyarên Zanîngeha Nevadayê, yên Zanîngeha Kalîforniyaya Los Angelesê û yê Zanîngeha Neteweyiya Awusturalyayê derbarê serkeftina zarokan de gihîştin hind encamên din ku ev encam diyar dikin ku malên lê pirtûk hene ji bo serkeftina zarokan bi qasî dê û bavên perwerdehiya zanîngehî dîtîne bi bandore.

Zanyar dibêjin ku malên xwedî pirtûkxaneyek bi qasî 500 pirtûkî li ser serkeftina zarokan bi qasî dê û bavên 15-16 sal perwerdehiya zanîngehî dîtine bi awayekî pozîtîf li ser zarokan bi bandor e.

Zanyar dibêjin ku zarokên ku li mala wan pirtûk hebin û dê û bavên wan jî xwende bin li gorî zarokên din ango zarokên li mala wan pirtûk nîn in û dê û bavên wan ne xwendebin bi qasî 3 salan li pêş in. Doç. Mariah Evansê kul i Zanîngeha Nevadayê di warê pedagojiyê de xebatên xwe dimeşîne li ser zarokên ku dê û bavên wan perwerdehiya zanîngehî nedîtibin lê ligel vê li mala wan pirtûk hene lêkolînek kiriye. Doç. Evans li çolterên Nevadayê di nav civakên ku di warê aboriyê de rewşa wan nebaş e de ji bo zarokên civakê di dema perwerdehiyê de çawa dê biserbikevin lêkolinan kiriye.

Li gorî van lêkolînan Evans destnîşan dike ku perwerdehî her çiqas buha be jî ligel vê pirtûk erzan in û ji bo serkeftina zarokan teqez li malan pirtûk hebin.

Evans derbarê mijarê de wiha dibêje: "Li gorî lêkolênên me em gihîştin encamek wisa kul i malênm qet nebe 20 pirtûk lê hene zarokên wê malê ji zarokên malên bê pirtûk hêdî serketîne û di warê perwerdehiya binind de ji ev zarok ji yên din gelek li pêş in." Li gorî lêkolînan derketiye holê ku li welatekî wekî Çînê ku gelheya wî li seriya milyarek e, malên ku lê 500 pirtûk hebin zarokên wê malê bi qasî 6 salan di perwerdehiyê de ji zarokên din pêşdetir in. Ev rewş li Amerîkayê bi qasî 2 salan e.

Li gorî lêkolîna kul i 27 walatan hatiye kirin bandora pirtûkan li ser serkeftina zarokan bi awayekî ber bi çav dertê holê.

Zanyar li gorî lêkolînê destnîşan dikin ku zarokên wan welatan yên pirtûk li mala wan hene ji zarokên pirtûk li mala wan kêm in an qet nîn in di perwerdehiyê de bi qasî 3 salan pêşdetir in. Zanyar dibêjin ku di serkeftina zarokan de pirtûk ji xwende an ne xwendebûna dê û bavan, ji kar û dewlemendiya malbatî, ji pergala polîtîk û dewlemendiya welatî zêdetir bondorê dike.

## Bûyerên ecêb li vî gundî bi dawî nabin

**MELETÎ**- Li gundê Topraktepe ya navçeya Doganşehîr a Meletê bi salan in bûyerên ecêb tên jiyîn. Li gund bûyerên wekî şewitandina malan, wêrankirina erdan û her wekê din tên jiyîn. Ev rewşa ku bi salan in didome rê li bertekên gundiyan vekir. Gundiyan heta niha gelek çalakî jî lidar xistin û xwestin ku rayedar dengê wan bibîhizin.

Li gundê Topraktepeya navçeya Doganşehîrê ev 11 sal in bûyerên ecêb diqewimîn. Şewitandina zevî, xanî û texrîbkirina erdan pêşî li çavkaniya debarê ya gundiyan jî girt. Her dawî jî 135 kewarên hingiv hatin şewitandin. Gundiyan li dijî vê nerazîbûnên anîn ziman.

11 sal berê ev bûyer bi birîna daristanan dest pê kir. Ev rewş di nava demê de texrîbatên din rû da. Yanî pirsgirêk hatin asteke cidî. Bi dehan carî gundiyan çalakî pêk anîn û herî dawî jî heta qeymeqamtiya navçeyê meşiyan. Gundiyan ji dewletê daxwaza çareseriyê kir.

### Tu kes nehatiye girtin

Heta îro bi hezaran dar, 135 kewarên hingiz, gelek zevî, hilweşandina axuran û gelek tiştên dinhatin texrîbkirin. Di demên dawî de jî du xanî hatin şewitandin. Di encam vê de windahiya can pêk nehat. Gundiyan heta niha gelek caran serî li rayedaran dan lê tu encam bidest nexistin. Failên vê bûyerê jî nehatin girtin. Li ser daxwaz û qêrîna gundiyan carekê tenê Parlamenterê CHP'ê yê Meletê Mewlît Aslanoglu çû gund û got ku dê vê pirsgirêkê çareser bikin.

## Hejmara ajokarên jin zêde dibe

**HEWLÊR** - Wefa Serdar piştî qurseke dû hefteyî ya ajotina otombîlê, ehliyeta ajotinê wergirt, lê ew ne bes bû diviyabû ku ji tirsa xwe rizgar bibe dema di destpêkê de otombîl dibir garaja malê yan dida pêşiya şofêrên din.

Keça kurd Wefa yê 3 salî li Hewlêrê zanîngehê dixwîne, meha yekem dema nû fêrî ajotinê bûbû otombîla xwe tenê heya ber deriyê malê dibir, dûre kilît dida birayekî xwe da otombîlê bibe garajê û rawestîne: "Her roj şermê min dipêça."

Lê niha piştî dû salan, Wefa yek ji van şofêrên jin e ku bawериya wan bi xwe heye û li ser cadeyên Hewlêrê otombîlan dajon. Wefa, êdî bi hêsanî otombîlê dibe garaja malê û bi wê qerebalixiyê jî ku demekê jê ditirsa, bêzar dibe. Heta jê tê dide pêşiya otombîlên din û bi vî rengî, demên ku ji ajotinê ditirsiya tawîz dike.

Wefa bo Rûdawê derbarê ajokariya xwe de ev gotin:"Min bala xwe bi tevahî da ajotinê. Di nav otombîlan de wek Jacky Shan im."

Ev dehên salan bû jimara şofêrên jin li Hewlêrê pir kêm bû, lê niha zêde tên dîtin, ev jî yek ji berhemên balkêş û serekî yên vejandina aborî ye û heta cihekî jî amajeyeke ser derketina guherînan di civaka mêrsalar a Hewlêrê de.

Di nava 5 salên borî de, jimara jinên ku ehliyet wergirtine li Hewlêrê dû qatan zêde kiriye. Sala 2005'an ji 10 hezar ehliyet, nêzîka 2 hezaran para jinan bûn. Lê tenê îsal heta niha, nêzîka 4 hezar moletên ajotinê yên jinan hatine derxistin.

Bi giştî, jimara şofêrên jin li Hewlêrê hê kêm e û tenê ji sedî 5ê şofêrên Parêzgeha Hewlêrê pêk tînin, ku 340 hezar kes dibin. Lê li hundirê bajarê Hewlêrê ku milyon kes tê de dijî û piraniya moletên ajotinê li vî bajarî hatine dan, zêdebûna jimara şofêrên jin û guherîna hevkêşa berê, bala mirovan dikişîne. Hê mêr zêdetir li bexçe û bazar û kolanên Hewlêrê tên dîtin, ev jî ji bandora mêrsalariya civaka kurd e.

Kesên modernxwaz bi dîtina şofêrên jin ku li ser cadeyan otombîlan dajon û guh nadin cudahiya regezî, şaş dimînin. Bi baweriya şofêrên taxsiyan li Hewlêrê, jin trafîkê têk dibin. Hîwa Necim li Hewlêrê şofêrê taxsiyekê ye, dibêje: "Jin nizanin otombîlan bajon. Tenê berê xwe didin ê pêşiya xwe. Nizanim çawa ehliyetê werdigirin." Hîwa amaje da, berî sê rojan otombîlekê xwe li texsiya wî da: "Bi ser de jî berî ji otombîla xwe dakevim, min zanîbû jinek wê otombîlê dajo. Şaşîtiya wê bû."

Rêveberê nivîsîngeheke ajotina otombîlan li Hewlêrê Aram Emîn, tekez dike ku jin hişyartir in dema otombîlê dajon: "Mêr xemsar in, lê jin rêbazanbicih tînin."

Xende Mihemed karmenda hikûmetê ye û ev çend sal in otombîlê dajo diyar kir ku ji aliyê şofêrên mêr hatiye acizkir. *(rudawnet)*



www.arsivakurdi.org